

# welat

Sal:1 Hejmar:31 20-26 İlon 1992 5000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyi

Ev çawa  
sosyal  
demokrasî ye!



Rüpel 5



Dibistan vebûn. Bi milyonan zarok dest bi dibistanê kirin û bi zimanê xwe dixwînin

## Lê zarokên me?..

Zarokno! Hûn bê dibistan nîn in. İro jiyana li Kurdistanê, çiyayêن welatê we, dibistanêñ herî bilind in. Bila dewleta Tirk, wan dibistanêñ asimîlasyonê bike qereqol, bila terorê ji xwe re bike kar. Lê dê nikaribe bibe asteng di riya perwerdebûna we de. Lewre hûn, li dibistanêñ herî bilind dixwînin. Tu dibistan weke ya we, nebûye sebebê evqas guherandinêñ girîng. Hûn di riya serxwebûnê de, niwênerên jiyaneke nûjen in. Hûn hêviya me ne.

Rüpel 8

## Dagirker di xwîna xwe de difetisin

Rüpel 9



Yaşar Kaya  
bersiva  
Uğur  
Mumcu  
dide



Z. Şikakî  
û Turan  
Çabuk li  
ser jina  
Kurd  
nivîsin



İsmail  
Göldâş  
'Komeleya  
Piştgirî û  
Bilindbûna  
Kurd' dide  
nasîn

Rüpel 12

Rüpel 4

Rüpel 6

## REWS



Abdullah Keskin

## Konfuçyüsên nû

Em hemû bi eynî zimanî dipeyivin, lê ji hevûdin fêm nakin. Çima? Xelet neyê fêmkirin: Armanca min ne cihêtî û zehmetiyê zimanê kurdî ne. Na! Ez dixwazim ji aliye kî din ve li ser uslûb û naverokê bisekinim.

Îro di civaka me de, mane û nave-roka gelek biwêj û peyvan guheriye. Ne di civaka me tenê de li dinyayê tev-de, biwêj û naveroka wan, peyv û maneya wan ji hevûdin dûr ketine.

Ev nexweşîyeke giştî ye. Li hemû dinyayê û li her qatén civakan; ji ro-nakbiran bigirin heta bi kesekî gundî ev nexweşî belav bûye.

Filozofê Çinî, berî zayıne (mîladê) bi sedsalan ev nexweşî ferq kiriye. Ji Konfuçyüs dipirsin: "Ku qedera civakê bidin destê te, tuyê cibikî?" Konfuçyüs dibêje "Berî hertiştî, ezê maneya biwêj û peyvan a rast bidim wan."

Di welatên mêtîngê de gelên ku mêtîngeran mëjiyên wan bi xwîna wan şûştiye û wan ji civaka wan re kiriye biyanî de, ev nexweşî dijwartir e. Em Kurd û welatê me Kurdistan, îro di vê rewşê de ne. Ji ber vê yekê ye ku, divê em rastiyêni giştî, ger gelekî hêsan bin jî, bînin ziman û tekrar bikin.

Rewşa welatê me û yên din ne wek hev e. Bê çawa gundiyyêne, ne wek gundiyyêne Swêdî ne, ronakbîrêne me jî, ne wek ronakbîrêne Frensî ne. Heger heta niha, me keşf nekiribe (tu delîlên kifşê xuya nakin) divê em ji vir û pê ve kifş bikin. Belê, em Kurd, Amerîkayê ji nû ve keşf dikin. Em ji nû ve bi xwe dihisin, ji nû ve xwe nas dikin û ji nû ve ji bo guhertina vê rewşa xerab, ev rewşa ne layiqî me, dibin rês û dikevin rê.

Li Kurdistanê, têkoşîna gel ev de-

**Xelet fêm nekin, ez naxwazim fonksiyona ansiklopediyan gelek zêde bikim. Bi baweriya min, zanînên ansiklopediyan gelek bi sînor in. Maddeyên ansiklopediyan wek zanînên di nasnameyan de têne nivîsin. Lî îro em ji her tiştî bêhtir, hewceyi zanînên ansiklopedîk in.**

meke dirêj e ku li dar e. Pêşveçün û guhertinêne pirr mezin çêdibin. Berî 10-12 salan, Kawayê hemdem ji vê civakê der ketin. Lî hê jî torevan û nivîskarêne yêne nû der neketine. Ehmedê Xanî yêne hemdem xuya nakin. Romana me nîn e. Şîrîn me Kurdish hê bi wezna arûzê têne nivîsin. Muzîs-yenêne yêne hemdem gelekî kêm in, yêne hene jî, teqlid û waryantê huner-

mendên biyanî ne. A xerab, hê jî, di tu şaxî de, ansiklopediyêne nîn in.

Xelet fêm nekin, ez naxwazim fonksiyona ansiklopediyan gelek zêde bikim. Bi baweriya min, zanînên ansiklopediyan gelek bi sînor in. Maddeyên ansiklopediyan wek zanînên di nasnameyan de têne nivîsin. Lî îro em ji her tiştî bêhtir, hewceyi zanînên ansiklopedîk in.

Her tiştî me berevajî bûye. Em bi eynî zimanî diaxivin, lê ji hevûdin fêm nakin. Sedema mezin ev e: Herkes her peyvê diguhêre, li gorî xwe maneyeki din didê. Du kes digihêne hev û kovarekê der dixin. Sê-çar "tevger" alîkariyê didin. Şes-heft kes li hevûdin kom dibin, weşanxaneyek vedikin. "Weşanxaneya Kurdan", "Kovara Kurdan." Wilo têne binavkirin. Lî tu eleqa wan bi Kurdish re, bi zimanê kurdî re nîn e. Em Kurd di warê ronakbîrî de, dişibin zarokêne ku nû ji şîr vedibin. Şîrî me qut bû. Divê hêdî hêdî dest bi meşê bikin. Çareserkirina pirsgirêkîne me, ne zehmet e.

Heger em, mane û naverokêne peyv û biwêjan a rast bidin wan, ewçax, çi-qas xeletî û zehmetiyê zimanê me hebin jî, emê ji hevûdin fêm bikin. Emê di welatê xwe de ji hevûdu re ne biyanî bin. Ewçax dîtinêne me yên siyasi ci bin jî, emê karibin ji bo ferhengê, an alfabe, an jî pirtûkeke grammarê bêne ba hevûdin. Ji bo vê yekê jî, divê ji civaka me, bêhtir jî, ji nav ro-nakbîrîne me, Konfuçyüsên nû der kevin. Ew Konfuçyüsên ku, mane û naveroka peyv û biwêjan ên rast bidin wanl.

## FERHENGOK

- Aloz: 1. Petiyâ (çürülmüş), 2. hasin
- Alozbar: (çürüyebilir)
- Alozi: (çürüklük, bozukluk)
- Berz: Mezin, saxlem, bilind
- Dadgeh: Mehkeme
- Dadpîrs: (sorgu hakimi)
- Dadger: Hakim
- Doza raya giştî: (kamu davası)
- Dozger: (savcılık)
- Dozgerî: (savcılık)
- Honak: Rêxistin (örgüt)
- Kelmist: Şeltek, mizoke
- Kesitî: Kesayetî, şexsiyet (kişilik)
- Mijar: Babet (konu)
- Nakok: Dijber (çelişik, çelişkili)
- Nakokî: Dijberî (çelişki)
- Peyvrêzi: Sentaks (söz dizimi)
- Pêjingeh: Metbex (mutfak)
- Proses: Demajo, pêvajo
- Ragihandin: Gihandin (iletmek)
- Raye: (yetki)
- Rayedar: (yetkili)
- Rûxandin: Hilweşandin, ihmâkirin (yıkmak, ortadan kaldırma)
- Sernerm: Melahim, pindir (uysal)
- Sernermî: Pindirî (uysallık)
- Sersot: Bi hêrs, aciz (kızgın)
- Sersotî: Hêrs (kızgınlık)
- Sêwirmend: (danişman)
- Sêwirmendî: (danişmanlık)
- Tarasî: Bermayî
- Xasma: Bi taybetî, nemaze, nexasim (özellikle)
- Xasûk: Qurnaz
- Zagon: Qanûn
- Zîvar: Xizan, reben, feqîr

✉ ✉ ✉ ✉ ✉ ✉ ✉ ✉ ✉ NAMEYÊN XWENDEVANAN ✉ ✉ ✉ ✉ ✉ ✉ ✉ ✉ ✉

## BİNİVİSİN

Dr. Poloço

Napolyon digot: "Bi qasî ku, du kovar min ditîrsîn, sed tanq û top min natîrsîn."

Geli keç û xortên Kurd ên dilovan! Rabin ser xwe, milên xwe lê wergerînîn, tiliyên xwe yên narîn li pênuşê bigerînîn û binivîsînîn. Ez dizanim hûn biaqil in, hûn dikarin biafirînîn! Bila ji pênuşa we, xweşîya çiya û zozanêne Kurdistanê, evîna Mem û Zinê, mîrxasiya têkoşeran, pesnê av û çeman bizê. Bila pênuşa we, bi xurtî li ser kaxizê biçerixe, bila qîrîna têkoşîna salan jê were. Bila Ehmedê Xanî bigihîne Shakespeare, Mem û zinê bi ser Romeo û Juliayê bixe. Binivîsînîn. Xwe ber din binê derya kultura me, ya kevnar, di nav zargotin, medeniyet û evîne de bi avjînî bileyîzin; wan bigirin, yek bi yek der xin rûkala dîn-yayê, wan vejînin.

Geli keç û xortên Kurd ên dilovan, ji bo me demek nû dest pê kiriye. Em, ji kirêtî û nepakiyê rizgar dibin, em gava xwe davêjin jiyana bajarvaniyê, em hînî medeniyetê dibin. Lî medeniyet bê nivîsandin nabe. Medeniyet bê pirtûk, bê xwendin nabe. Barê civata me ya xweş, ya pêşerojê li ser milên we ye. Loma divê hûn binivîsînîn. Mijar pirr in, bûyer gelek in. Divê hûn pênuşen xwe weke şûr bikar bînin. Bila di dilê rojhîlat de guloka edebiyata Kurdî mîna bombekekê biteqe. Bila cirûsk û tîrêjîn wê li ser giyanê şehîdan biweşin.

## Kurdên derive

Ez ji Kurdên Ewrûpa û yên deriveyî Kurdistanê re dibêjim. Carek me îxanet kiriye ku em ji welat derkette. Lî dîsa peywir (wezîfe) ên me hene û divê em peywirên xwe bînin cih. Divê em hemû kovar û berhemîn partiyê bixwînîn. Ji tevan bêhtir gereke em Welat bixwînîn. Ji ber ku bi zimanê kurdî ye. Her meh jî divê her Kurd aîdat (mehan) ên xwe bidin. Û salê carek jî alîkariya partiyê bide.


Ew mirovê Kurd ku bibêje imkanê me tu nîn e, derewa dike. Lewre li Ewrûpa her imkan hene. Çiqaş tevger li welat xurt bibê divê li nav Kurdên deriveyî Kurdistanê, welatparêzî bêhtir bibe. Divê xebat zêdetir bê kirin, alîkariyê jî divê bi vî rengî û hwd. li ser Kurdên welatparêz ferz in.

Huseyin  
Älvadalen / Swed

## Pirtûkên kurdî çap bikin

Geli mamoste, rîzan, welat-parêz, mele û alimên me; pêwist e em xwe ji bona çap-kirina pirtûkên Kurdî amade bikin. Edî ji ci cureyî dibe bîla bibe; pirtûkên olî, xeyrî olî (dînî), dîrokî, metelok û hwd.

Ev a hezar sal e ku em di



DERKET

bin destê xwînmijan û kedxwaran de ne û zimanê me habîbî qedexekirin. Osmaniye sexte û dînfirosêne me, em bi dîn xapandibûn. Îro pêwist e ku bi tîpên latînî pirtûk bêne çapkîrin. Ku gel bi çanda (kultura) xwe û zimanê xwe nexwîne pêş ve naçe û binyat jî, ji bona wî çenabe û nabe miletek serbixwe.

Divê ji bo me Kurdish pirtûkên Kurdî bêne çapkîrin da ku em hewceyi pirtûkên Erebi, Farisi û Tirkî nebin. Herçî kesê ku karibe bila bi dil û can bixebe ji bo weşandina pirtûkên Kurdî. Kesê ku bi zimanê xwe nîzânibe binivîse û bixwîne ew ji gelê xwe nayê hesibandin. Bi ya min şoreşa herî mezin bi zimanê me çap-kirina pirtûkan e.

Ez ji hemû nivîskar û xebatkarêne rojnameya Welat re, bi qasî pelên daran û bi qasî giyayêne Kurdistanê spasi dîkim.

Mele Dilbixwin Tûj  
Wan

Serokê Komela Mafêni Mirovan yê Çolemêrgê, A.Kerim Demirel:

# 'Hikûmet Kontra ye'

Hefsarê hikûmetê ketiye destê MGK û Daire Şerê Taybeti, ji van sazgehêne Dewletê re, hikûmet bûye weke noterê.


Gel azadiyê dixwaze, heq û hiqûq dixwaze, gel koletiyê nema dipejirîne, xwestinê gel êdî ne elektirîk, rî, av û aborî ne, iro xwestina gelê Kurd rast û rast siyasi ye...

Kekê Kerim, ihlalkirina mafêni mirovan weke ci tê kîrin, ci astengiyen we hene, li ser zilm û kotekiye ku dewleta Tirk, li gelê Kurd dike, ji kermâ xwe re, hûn karin bînin ziman?

Hikûmeta Tirk li ser gelê Kurd gelek koteki û zilmê dike, iro tu riyan demokratik nemane, hefsarê hikûmetê ketiye destê MGK û Daire Şerê Taybeti, ji van sazgehêne Dewletê re, hikûmet bûye weke noterê. Li Çolemêrgê her ku timen dewletê yê taybeti tene kuştin, Waliyê Çolemêrgê, ji gelê Çolemêrgê re dibêje: "Wê Kurdistan ji Kurdan re bibe cehnem". Dewlet ji kerba gerfla, bi ser gelê Çolemêrgê ve diçe û kela xwe di serê wan de hêdî dike.

Dema ku dewlet ihlalkirina mafêni mirovan dike, li hemberi van politikayen dewletê hûn ci dikan?

Em komela mafêni mirovan, li hemberi vê zilm û kotekiye dewletê ne. Dewlet zilmê dike, gundan talan dike, heta sewalêwan telef dike. Em dixwazin ku ev ser biskeine, ev birakujî neyê kirin, ev xwîn neyê rijandin, ne xwîna gerîlayekî, ne xwîna polise-



Serokê Komela Mafêni Mirovan yê Çolemêrgê, A.Kerim Demirel

kî, ne xwîna gundi û mirovîku welatparêz, ne ji xwîna leşkerékî Tirk neyê rijandin.

Iro rewşa cerdevanen gund, cehşen xwefiroş li Çolemêrgê çawa ne?

Kesên ku bûne cehş, ne ji xwestina xwe û bi hemd û vîn (îrada) xwe bûne cehş, di destpêkê de, dewleta Tirk, bi destê eşirênen xayin û neyarê doza Kurdistanê çekan dane destê wan. Serokên eşiran, eşirênen xwe li hember doza neteweyî kirin neyar. Bi serhildana têkoşîna Kurdistanê re, têkilî û tesira eşirtiyê ji heke ne bi tevayı ji holê iro ranebûbe ji, ji hev feşkiliye û bingeh ji serokê eşiran re nemaye, cehş hêdî hêdî dozê fêm dikin û dev ji çetetiyê ber didin. Iro 35 hezar cehş li Kurdistanê hene, ji van 35 hezaran, 15 hezar jê, li derdorê Çolemêrgê ne, serokê van çetan yek jê Tahir Adiyaman e, ew mezinê eşîra Jîrki ye, yê din ji Mustafa Zeydan e.

Iro rewşa gel çawa ye, xwestin û armanca gel ci ye?

Iro ez bi bawerî û ji dilê safi dibêjim, gel geleki bi qirar û hevgirti ye, ji ber vê zilm û kotekiye dewletê gel hin zehfir bi bîr û bawer û tifaq bûye,

## Xortenê Kurd ji eskeriya TC direvin

Bi pêşketina têkoşînê, her keseki Kurd, ji bo dewletê bûye hedef. Êdi xortenê Kurd li leşkeriyê ji ber Kurdbûna xwe, tadeyek giran di-bînin.

Di van demen dawî de, Kurdên ku leşkeriyê di artesa Tirk de dikin, li riya revê digerin. Ên ku di derheqê wan de, şikek biçûk ji hebe, an tene girtin, an ji leşkeriya wan dişewitînin. Li gor hin nûçeyen ku ketine desten me, bi dehan xortenê Kurd ji, bi zanebûn hatine kuştin, dawî ji wan, wek zayıfata talîmê nişan dane.

Ev bûyera dawî ji, li İzmîtê, li Gölcükê pêk hat. 8 Kurdên ku di keştiyek (gemî) leşkeriyê de, leşkerî dikirin, ji ber zora serbazan xwe (yüzbaşı) ji keştiyê revyan. Leşkerek ji van firaran, mesela firara xwe, wiha anî ziman: "Dema em di talîmê de bûn, ên Tirk, li kantinê didan rûniştandin, me ji wan cuda digirtin, ji bo tişteki biçûk berê me didan dadgehan (mehkemeyan.) Li sar van tiştan, me ji bîryara revê da. Daxwaza me ew e ku, tu Kurd bila nece leşkeriyê."

Heppevin: S. Arjen

# HAWAR

Dilbixwîn

## Nivîsoka min

Nivîsoka min;

Aza ye, hedara (sebir, hedin) wê di nava çarçivan de nayê. Ev her sê tiliyen min, ka ew pêçane, nikarin çember bikin azadiya ku nivîsoka min têde jiyan dibe. Ji lew re dema ku dinivisine-rexne bi ser de dibarin tu caran nivîsoka min ji rexneyen objektif natirse. Dema ku bûyerek li pêşîya çavan biqewime, hema yekser, der dikeve ser singa rûpelê û şîrove dike.

Nivîsoka min;

Sînor û pasporten dijmin nas nake. Ji lew re li ku derê Kurd hebin nivîsoka min li wir e. Bi wan re li kar e, di şin û şahîyan de le gel wan e, Kêliyeke tene jî nikare xwe ji wan qut bike. Ne tenê gel; gerîla jiyana gel el! Lewma yên ku jiyana gel diparêzin nivîsoka min, tifinga li ser milê wan e, yên ku bi gel dilizin û dibin bazarê (pazarê), nivîsoka min kelem û dasiye di çavêwan de ye. Nikare ji dijmin û dosten dijminan hez bike, ji ber vê yekê li

**Gotinê nivîsakan dijwar in. Gotinê rast dibê ji hinekan re tal be. Lê ew dijwari dijwariya demê ye. Li dijî dijwariye tenê dijwari dikare xwe biparêze.**

en diçin rûyê Sedam û Özal maç dikin re bikene, ew maç, maçen xiyanet û xwefiroşiyê ne.

Nivîsoka min;

Bi karwanê serxwebûnê re ye. Di dema birçibûn, tibûn, nobet, derbaskirina sînoran, êrişê-revê ... û şehîbûnê de, digel serbaz û şoreşgeren wî karwanî ye.

Livbaziyên gerîla giyanê didin nivîsoka min. Bêyî gerîla jîyan mirî ye, gelo buhayê ci ye, nivîsoka min dema ku li ser şehîdan kêliyekê raneweste, dema ku bi zarokên Cizirê re, êrişê nebe ser tanq û topen dijmin, dema ku bi keç û jinan re nelîlin... û dema ku nebêje "Bijî Serok Apo!"

Belê tu caran nivîsoka min xwe nikare ji "Bijî Serok Apo!" û "Bi can bi xwîn em bi te re ne ey serok!" qut bike. Her kes dikare ji xwe re çirokan bibêje, lê hema nivîsoka min bi 30 milyon Kurd re ye. Bi milyonan Kurd slogan "Bijî Serok Apo!" bilind dikin, nivîsoka min ji mecbûr e bilind bike, lewre divê were zanîn Serok gel e, gel Serok e!

Nivîsoka min;

Ji yên ku Huseyîn Deniz kuştin natirse. Ne kontra û ne ji timen taybeti, nikarin qêrîna nivîsoka min bidin rawestandin. Edî şûn vala namînin. Belê, berê şivan û gavanî dikuştin, niha desî bi rewşenbîr û nivîskaran kirine, eger xîret û rûmet bi nivîsoka min re hebe, divê heyâ keliya dawiyê li ber xwe bide. Eger bixwaze mîna belavokên "Kurdistan press..." ê binivisine, ez ji niha ve soz didim gel ku ne xwediyê wê nivîsokê me.

Dijwar in gotinê nivîsoka min, lê ew dijwari dijwariya demê ye. Li dijî dijwariye tenê dijwari dikare xwe biparêze. Edî mîna berê nivîsoka min ne feqîr û belengaz e, nayê kîrîn û nayê firotin...

Nivîsoka min;

Soz daye, sozê berxwedanê, sozê meşa bi gel re, sozê girêdana bi Serok Apo ve... Tu hêz nikarin nivîsoka min ji vî sozî qut bikin.

Banga nivîsoka min; werin... werin... werin ev hatina we jiyana we ye, dûrbûna we nezîkbûna mirinê ye.

Biborînîn,

Nivîsoka min dixwaze gelek tiştan bibêje, rî dirêje, li vir em gotina xwe bê dawî diqedînin. Heya hejmareke din bîmînin di xweşiyê de rojbas....

Rojnameya hefteyî ya Amerîka Workers World

# 'Mangayê mirinê gelê Kurd qetil dikan'

Nûçeyen Derve- Rojnameya hefteyî ya ku bi zimanê ingilizî li New Yorkê tê weshandin Workers World, di hejmara xwe ya dawî (hejmar 37, 10 Ilon 1992) de, bi firehî cih daye qetlîama Şîrnexê, kuştina rojnamevanan û têkiliyên serokatiyên PDK û YNK ê yên bi dewletên imperialist re.

Niviskarê Workers World, Bill Doares bi sernivisa "Turkish paramilitary death squads killing Kurds" (Mangayê leşkeriya Tirk ên mirinê Kurdan dikujin.) pêşî li ser kuştina rojnamevanen Özgür Gündemê disekine. Nivis wiha dest pê dike. "Roja 9'ê Tebaxê, niviskarê rojnameya Özgür Gündemê Huseyîn Deniz, li başûrê rojhilata Tirkîye (bakurê Kurdistanê) hate kuştin. Tenê 10 roj beriya kuştina wî, nûçevanen Özgür Gündemê Yahya Orhan hatibû kuştin û Burhan Karadeniz hatibû birîndarkirin. Ev bûyer, du heste pişti weşandina

Özgür Gündemê qewimîn.

Di meha Sibatê de jî, muhabirê kovara 2000'e Dogruye Halit Güngör û yê rojnameya Yeni Ülkeye Cengiz Altun hatibûn qetilkirin. Ev kuştin ji aliye kontr-gerî-

la ve pêk hatin. Kontr-gerîla bi terora xwe ya ku li hember gelê Kurd dimeşîne, tê naskirin. Tê bawerkirin ku ev tîmîn taybetî yên mirinê, ji teref Artêşa Tirk a bi peren Amerikayê ve tê destekkirin

û hatiye birêxistin.

Amerika, salê 500 milyon dollar alîkariya leşkerî dide dewleta Tirk.

Weşanen wek Özgür Gündem, Yeni Ülke û 2000'e Doğru, ji ber ku



*Li gorî Bill Doares; 'Tirkîye, ji bo perçiqandina PKK'ê, bi Berzanî û Telabanî re hevkariyê dike.'*

## GOTİN



Yaşar Kaya

### Uğur Mumcu

Divê edî gelê Kurd û ronakbîrên Kurd neyarênen xwe nas bikin. Uğur Mumcu ji, yek ji wan neyarän e. Ev nêzîkî 25 salan e, Uğur di rojnameya Cumhuriyetê de dinivise. Heta iro, ji bo Kurd û Kurdistanê tiştekî baş negotiye. Lî belê ev 2-3 meh in ji bo Kurdan geleb tiştan dibêje. Uğur bi kemalîstbuna xwe re, niha bi dengekî tarî bûye borezanê dewletê. Dilê wî heye Kurd bi hev kevin, hev û du bikujin ku ew ji şâ bibe. Rojekê ji pirtûka Kemal Burkay rîzîkî hildide, dibêje binêrin, Kemal Burkay ji bo filan camêrî ci gotiye. Rojeke din, dibêje serok Öcalan ji bo filan kesî wiha gotiye. Berzanî ji bo Telabanî ci gotiye, Berzanî ji bo İbrahim Ehmed ci gotiye. Celal bi Bexdayê re bû yek û ji ber vê yekê ji cehş e. Şêx Seîd û Ingilîz dest dane hev, paşê serhildanek li dar xistin. Kurdîn ku li Tirkîye ne giş xayîn in, wan di her demê de, destê xwe dane dewletên din û bi cümhûriyetê re xa-

yîntî kirine. Bi Kurdan re mirovatî û dostanî nabe...û hwd. Ci tê ber devê wî dibêje. Tu kes bersivekî nade vî faşistî dev bi xwîn.

Berî her tişti, Uğur Mumcu ne demokrat e, ne ji ronakbîr e. Uğur Mumcu kemalist e. Niviskarekî ku bi ideolojiyek wiha bigire, nabe ku bibe demokrat.

Em dikarin ji Uğur bipirsin, 25 sal e, te ji bo gelê Kurd ci xwestiye? Tu çima gelê Kurd înakar dikî? Tu çima neyarê Kurdan i? Bersiva xwe bide.

**Berî her tişti, Uğur Mumcu ne demokrat e, ne ji ronakbîr e. Uğur Mumcu kemalist e. Niviskarekî ku bi ideolojiyek wiha bigire, nabe ku bibe demokrat.**

Tu, piştgirê ideolojiya dewletê yî, tu, humanist ji, nîn i. Edî li dînyayê niviskarênen mîna we nemane. Ji demeke dirêj ve ye, li dinê ji bo gelê Kurd geleb tiş tene nivîsandinê. Gelo hûn çima nikarin tiştekî rast binivîsin? Ev şerma we ya mezîn nîn e?

Ji pirtûk, rojname û kovaran, nivîsan hildide, di quncikê xwe de dinivise û dibêje, hûn zanibin ku ez di der-

heqê Kurdan de, gelek tiştan dizanim. Uğur Mumcu, di derheqê Kurdan de, tu tişti nizane. Bi xwe jî, bi devê cendîman deng dike. Bila dev ji van dek û dolaban ber de. Edî ne Kurd Kurdîn berê ne, ne ji Kurdistan Kurdistan berê ye.

Ji bo biratiya gelên Kurd û Tirk, neyartî ne riyeke baş e. Kî ci dixwaze, bila bi pêş de were, em ji hev re gîlî û gazînên xwe bibêjin. Bi şer, bi xwîn, biratî nabe. Ev şerê han jî, 30 salan nadome. Gelê Kurd ci dibêje, ci dixwaze, guhê xwe bidinê. Gelê Kurd tiştekî zêde naxwaze. Dibêje, ci heq ji bo gelê Tirk hebin, divê ji bo me ji hebin. Divê kurdî qedexe nîn be, dibistanen me ji hebin, radyo û televîzyona bi kurdî ji hebe, li Kurdistanê zimanê kurdî zimanê fermî be, divê Kurd li bajarên xwe waliyên xwe hilbijerîn, rojnameyên kurdî der kevin. Ev daxwaz ne zêde ne. Li Kurdistanê nexweşxane hebin, xelk ji nexwesiyen sivik nemirin, li zanîngehan zarokên me bikaribin bixwînin, em ji mîna mirovan bijîn. Li dînyayê tu gelê bindest nemaye. Lî ji bo me tu heq nîn in. Ev 70 sal e, tu kes, tu tiş nedaye me. Daxwazkirin heqê gelê Kurd e. Em rûnên, bi biratî gelek şixulan xelas bikin. Bi biratî, erê, lê bi bindestî nabe.

rûyê terora Artêşa Tirk û zilma wê ya li hember 15. mîlyon Kurdîn Tirkîye der dixin meydanê, bûne hedefê kontr-gerîla.

Ji cara sisîyên Kurdan li Tirkîye (Li Kurdistanâ Bakur) dijîn.

Ev teror, ji 15'ê Tebaxê ve, ku salvegera hilpişkîna şerî çekdarî yê PKK'ye zêde bû. PKK (Partiya Karikerîn Kurdistan), ji bo serxwebûna gelê Kurd têdikoşe."

Bill Doares, di derbarê kîrinên sistema Tirk de nivîsa xwe bi vî awayî didomîne: "Sistema Tirk bi êrîşan, li ser gelê Kurd qetîfaman diceribîne. Li Şîrnexê, di 15'ê Tebaxê de kesen sivil hatin qetilkirin û gundêne nêzîkî sînor hatin bombekirin. Di van êrîşan de, bi balefirê F16 an ve, bi sedan kesen sivil hatibûn kuştin.


Pentagon ji, di operasyonan de alîkariya istixbaratê dide Artêşa Tirk.

Bill Doares, di derheqê PDK û YNK ê de jî vê şiroveyê dike: "Dewleta Tirk ji bo perçiqandina PKK'ê, bi Berzanî û Telabanî re hevkariyê dike. Berzanî û Telabanî, ji aliye CIA ve tên destekkirin. Partiya Berzanî PDK, li Kurdistanâ Iraqê alîgirîn PKK'ê dikuje." Li gor şiroveya Bill Doares, PDK û YNK, herdu partiyen ku bi alîkariya Amerîka li pey avakirina dewleteke biçûk in, dixwazin bi Tirkîye re hevkariya xwe zêde bikin û PKK'ê bidin sekinandin.

Bill Doares, di gotara xwe de behsa livbaziyên gerîlayên PKK'ê ji dike: "Roja 30'ê Tebaxê gerîlayên PKK'ê girtin ser qereqola Alanê, (navçeya Çolemêrgê) û bi dehan leşkerên Tirk kuştin.

Hikûmeta Amerîka bi awayekî durû, ji aliyeke ve, ji bo petrolê, piştgirî dide Kurd û Şîyyîn Iraqê, ji aliyeke din ve ji, ji bo qirkirina gelê Kurd alîkarî dide dewleta Tirk. Kesen ku dixwazin mangayê mirinê protesto bikin, bila protestoyen xwe bişînin vê navnîşanê: President Turgut Özal, Ankara, Turkey."

# Ev çawa sosyal demokrasî ye!



inönü, di bin perê Demirel de û bi talimatê generalan politikaya nijadperestiyê dimeshine.

M. Ali Tüysüz

Wek tê zanîn di dawiya sedsala 18 an de, sosyal demokrasi wek alternatiyeke li dij liberalizmê û kevneperestiyê der ket holê û bû bir û bawerî û siyasetek gelêri. Heta sosyal demokrasi, hîmê marksizmê bû. Berî şerî cihanê yê yekemîn li Ewrûpa, çend grûbên şoşegger ji ber gelek sedeman li dij sosyal demokrasiyê cephe girtibûn û vê jî, rî ji bo damezirandina partiyê komünîst vekiribû. Bi gotineke din hêzén ku partiyê çep damezirandibûn, ji partiyê sosyal demokratan vejetiyabûn. Ew rewş bi pirranî li hemû welatên Ewrûpa wisa bû. Li dû vê vejetandinê, partiyê sosyal demokrat dixwestin bi riya reformizmê sosyalizmê ava bikin. Partiyê din yên şoşegger jî şoşê diparastin.

Lê dîsa jî partiyê sosyal demokrat ji destpêka sedsala me heta iro, li gelek welatên Ewrûpa tradisyonek pêşverû li dij kevneperestan domandiye. Mumkun e mirov li ser pêşverûbûna wan gotûbêj bike û rexneyên mezin li wan bigire. Rexne ne bê heq in, lê dîsa jî li hemû welatên ku sosyal demokrasi û hêzén wan hene,

têkoşîna siyasi ya iktidarê di navbera wan û partiyê kevneperest (paşverû) û liberal dedom kiriye û hîn iro jî li Ewrûpa nakokî (dijitî) yêngingin di navbera wan de hene. Bi gotineke din, di siyaseta sosyal demokrasiya Ewrûpa de hîn ramânê ku mirovatiyê heta cihêki diparêzin hene. Wekheviya rastin ya esasi neyê parastin jî, siyaseta sosyal demokrasiyê heta derecekê li dij diktatorî, faşizmê yan jî nijadperestiyê xwe nişan dide.

Ew sosyal demokrasiya Ewrûpa ye. Gîrsa gel, li welatên ku sosyal demokrasiyê iktidar demeke kin an jî dirêj bi dest xistiye, gîhiştiye qonaxeke demokrat. Bi meşandina siyaseta xwe ya aborî welatên xwe ber bi dewlemendiyê ve birine. Mirov dikare bibêje; Ewrûpa bi sosyal demokratan bû Ewrûpa.

Li aliye din sosyal demokrasiya Tirkîyê jî, ew çend sal in, heye. Wan tenê navê sosyal demokrasiyê ji Ewrûpa hilgirtine. Di warê bir û bawerî û siyasetê de qet nêzîkayî di navbera sosyal demokraten Tirkîyê û Ewrûpa de tune ye. Ferqa partiya sosyal demokrata Tirkîyê -di bin serokatiya sersememok (Inönü)- û yên faşist tune ye. Ev sosyal demokrasiyeye çawa ye

ku bêhna nijadperestiyê jê tê. Ev sosyal demokrasiyeye çawa ye ku bi partiya Demirel a kevneperest û faşist re dikare di hikmetekê de rûnê û bi emir û talimatê generalan siyasetek hov bimeşine. Ew çawa mirov û siyasetvan in ku di vê partiyê de cih digirin û pê re alîkarî dîkin. Koalîsyona van û Demirel ji roja ku çê bûye heta iro, zilm û zordariya mekanîzma dewletê di her warî de li ser gelê Kurd deh car hovtir bûye.

## AN SERKEFTİN

### AN MİRİN

Zimanê Kurdan mumkun e edî ne qedexe be. Lê jiyanâ Kurdan iro qedexe ye. Kuştin serbest e. Tijekirina girtîgehan û lêdan serbest e. Kontra serbest e. Ma mirov tune bin, bi zimanê kurdî axaftin ji ci re ye. Serokati di cihêki de wiha dibêje: "Em aşîti dixwazin, lê mirov nikare aşîtiya ku hezar carî ji mirinê xirabtir be, saetekî bide domandin." Rast e, bi derew û fêr û fûtên sosyal demokrasiyê aşîti nabe. Roj bi roj, hêdî hêdî candan an jî mirin, mirineke bê rûmet û bê armanc e. Ji bo gîhiştina jiyanê bê mirin, divê em berê, bimarin. Ji bo vê ye ku gelê me bi dengekî diqîre: "An serkeftin, an mirin!"

## Li zîndanan berxwedan

**Navenda Nûçeyan-** Di zîndanê Tirkîyê de îşkence li ser girtiyan dom dîkin. Li aliye din, li hember van îşkenceyan berxwedana girtiyan siyasi jî nasekine.

Bi taybetî, di van mehîn dawî de, li gelek zîndanan, dewlet dixwaze mafen ku bi berxwedana hatine bidestxistin, ji girtiyan bistîne. Lê girtiyan siyasi, disa li ber xwe didin û bi piştgiriya komele û mirovên pêşverû dengê berxwedana xwe bilind dîkin.

Nîha hemû girtiyan siyasi yên zîndanê Izmirê (Sultanhîsar û Buca) li dijî zêdebûna pesta rîvebirê zîndanê û dij warbûna şertîn hundir, dest bi greva birçübûnê kirine. Hefteya bîhûrî, li girtîgeha Buca, ji ber dijwarkirina şertîn hundir di navbera girtiyan siyasi û peywardarê (wezîfedarê) girtîgehê de şer der ket. Di vî şerî de, ji 78 girtiyan 58 girtîbirîndar bûn, birînê (20) girtiyan xedîr in. Girtiyan dest bi greva birçübûnê kir.

Li zîndana Sultanhîsarê jî, girtiyan siyasi li hember qetîma Şîrnexê ji bo sê rojan ketin greva birçübûnê.

Li aliye din serbazê Tirk li ser leşkerên Kurd ên di Arteşa Tirk de leşkeriyê dîkin, pesteke giran dimeshînîn.

Li gor agahdariyê gîhiştine me, gelek leşkerên ku bi eslê xwe Kurd in, di nav leşkeriya Tirk de têna taqîpîrin, û ji ber ku ne faşist in, muxbîriyê na-kîn, têna girtin. Saffet Keyfi yek ji wan e. Saffet berî deh meha, dema sê roj ji termambûna leşkeriya wî re diminê, tê girtin û deh meh di zîndana leşkeri ya Wanê de dimîne. Li zîndanê, di pêvajoya deh mehan de her roj îşkence dîtiye.

Saffet Keyfi, li ser rewşa zîndanan wiha dibêje:

"Li zîndanê gelek kesen ku ji leşkeriyê firar kiribûn, hebûn. Ziya Efe, Naif Avcı û Yalçın Uçay sê kes ji wan leşkerên firarkiri bûn. Her sê jî Kurd bûn û li wan îşkenceyeke pir dijwar dihate kirin.

## TUSİAD û Cavit Çağlar

**Navenda Nûçeyan-** TUSİAD, komeleyeke karbîdesten Tirkîyê ye. Ev komele, di hemû kîrinê dewletê de, xwedî biryar e û tu hikmet li dijî zanîna vê komeleyê nikare bilive.

Cavit Çağlar jî, yek ji dewlemendên Tirkîyê ye û ew jî, di nav vê komeleye de, xwedî deng e. Ev demeke ku Çağlar, berê xwe daye TUSİAD û wan bi zemkariyê tewandar dike. TUSİAD jî, li hikmetê rexne digire û bersivan digihîne Çağlar.

Li vê derê tiştekî balkêş der dikeve holê. Çağlar bi xwe, ji

hemû karbîdestan bêhtir buhayê eşayayê ku di febrîqeyen wî de çedîbin zêde dike. Ev jî nîşan dide ku, armanc ne mesala buhayîye ye, şolikirina rojêye.

Lewra hemû rojname, weke ku tu pirsgirêkên din tûnebin, vê bûyere der dixin manşetên xwe û raya giştî bi van tiştekî vala mi-jûl dîkin.



Ev wêne, rastîye bêhtir dide xuyaktırın.

### Özal mebûsên HEP'ê qebûl kirin

Mebûsên Şîrnexê yê Partiya Keda Gel (HEP), rapora ku di derbarê Şîrnexê de amade kiribûn pêşkêşî Özal kirin.

Mebûsên Şîrnexê, Mahmut Alînak, Orhan Doğan û Selim Sadak rapora xwe di 16 ê ilonê de, li Çankayayê pêşkêşî Özal kirin. Pişti civîna bi

Özal re, ji bo çapemeniyê daxuyaniyek kirin. Di daxuyaniyê de Mahmut Alînak got ku: "Özal jî naxwaze li herêmê xwîn bê rijandin. Em dixwazin ev gelş bi riyan demokratik hel bibe."

Rast e, iro mirov kijan berpirsiyare dewletê bi de peyiwandin van gotinan bi lêv dîkin. Lê belê di pratikê de, vajîyen van daxuyaniyîn tîst têne kîrin.

Dîtinê Bazîl Nîkîtîn:

# Cihê jina Kurd di civaka Rojhilat de

## Zîna Şîkakî

Jiyana jina Kurd bi rengeki baş wêneyê gelê Kurd berçav dike. Di vî warî de, Minorsky wisa dibîne: "Tê diyarkirin ku Kurd di nava mîletên Musulman de ve-kirîtirin (herî vekirî) mîlet e. Hemû kar û barê malê, li ser milêjinên Kurd in. Ew in ên ku, baran li dewaran dîkin û jê datînin; ew in ên avê dikşînin, diçin bêriyê, ard û kom dîkin, êgir (agir) amade dîkin û di ber van karan gişan re jî, her tim za-rokêwan û şîrmij li pişta wan şidandiye. Rast e li hêlekê, ew bi kirina van karan gelek hêz distînîn, lê li hêla dinê jî, ew zû ci-waniya xwe winda dîkin û dibin wekî mîran. Tenêjinên serokên hozan (eşîran) jiyana wan bê west e; ew tenê li ciwaniya xwe dinêrin. Hemûjinên din li hespan siwar dibin, bê tîrs û bê fedî bi mîran re didin û distînîn, ew bê tîrs di çiyan û baniyan re hil-diperikin (hildikişin).

Ji ber girîngî û giraniya rola jinan di malê de, pirrîn caran mîrê Kurd jineke xwe ya tenê heye û kesitiya jinekê di hundir malê de pirr heye û gotina we derbas dibe. Ew e ya ku serokatiya malê dike, kar û barê wê bi rî ve dibe û bi rîk û pêk dike; ew xwarinê amade dike, parve dike û bêyi gotina wê kes dest bi xwarinê nake. Ger mîrê wê ne li mal be, ew deriyê xwe ji mîvanan re vedike û bê fedî û tîrs bi wan re mijûl dibe.

Jinêndan ser çavên xwe nagirin, di nava civatê de bi

mîran re didin û distînîn û di nava civatê mezin de jî şora (gotina) wan pere dike." Soane dibêje: "Li gûndan, pirrîn caran kebaniya malê, eger malxweyê wê, ne li mal bûya, mîvantîya min qebûl dikir, ew rûniştî dima û bi min re deng dikir; ne wekîjinê Tirkan û Farisan heyê wê bi rengeki vekirî û bi rûyekî li ken, nîrinê xwe li ser tiştan ji min re digot. Dema malxweyê wê dihat, kebanî, jî bo xatirê mîvanî û da ku bala malxweyê xwe bikşîne ku mîvanekî wan heye, ew ranedibû, heya ku malxweyê wê biçûya, li axurê, hesp girê bida û bihata bin kon." Tu carîjinê Kurd xwe dûr naxin û xwe venaşîrin. Jinêndan bi rûmet in, her tim li dûzan in, rûges in. Kunditî di nava Kurdan de nîne, tevîku vê yekê di herêmê de tiştîkî deng daye.


Jin, bi taybetî li ba Kurdan, kesitiya wê heye. Ev tiştî hanê jî ne ji ber xwe ve hatiye ji bo nimûne, eger dê bi jîrbûn û rînbûna xwe dengdayî be, pirrîn caran kurê wê bi navê wê tê navkirin: lawê filanê, li şûna lawê filanî. Pirr nimûne hene ku çawa jinêndan serokatiya eşîran kirine û birêvebirina kar û barê wan hemû jî, dane ser milê xwe. Wekî tê zanîn ku dema Tirkan Hekari cara dawiyê bi destê xwe xistin, herêm tev di binê idara jinekê de bû (Hartmann binêrin.) Minorsky dibêje: "Min bi xwe di payîza 1914 an de dîtiye ku, li bajarê Helepeç (nêzîkî Sulêmaniye, Tirkan

ew herêmâ bi navê Osman Paşa nav kiri bûn) Edûl Xanim a bi nav û deng, jinebiya Osman Paşa, wekî mîrê wê her tim ne hazir bû, wê idara herêmê dikir."

B. N. çend nimûneyan ji diyar dike: "Meryem Xanim, jinebiya Şêx Mihemed Sîdîq, ez pirr pê kîfxwes bûm, dema min bi vê jina Kurd re deng kir. Vê jina ku bi tena serê xwe li Nehrî hemû kar û barê malê dabû ser milê xwe. Sala 1916 an, dema ku leşkeren Rûsa bi ser herêmâ Şemdinan de hatine, li herêmâ jineke Kurd hebû, jinebiya Omer Axa, serokê Milan. Ew tenê bist û du salî bû dema mîrê wê dimire; wê hikûm li gişî dikir û hemûyan qedrê wê digirtin. Wê ne kêmtrî mîrekî, kar û barê elê bi rî ve dibrî. Camer Louis Massignon bala me dikişîne ser jîhatîbûn, pergâl û rîndbûna jinêndan Ezîdiyan; her kes hêviya bîmalbûna bi wan re, dike.

Kurd bi xwe çawa jina Kurd dibînîn? Nîrîna Kamûran Bedîrîxan bi xwe ev e: "Kurd tu carî naponijîn (nafikirin) ku jinan li mal bigirin, veşîrin û ji meydana jîyanê bi dûr xînin. Ew pê bawer in û maf û berpirsiyariyê wê jî, berhamberi yêñ xwe dizanîn."

Di nava Kurdan de dayîk her tim ji ber hêvotina (timarkirina) keça xwe berpirsiyare. Ew wê wekî birayê wê hoyî stranî neteweyî yêñ Kurdi, dîlanê, si-warbûna hespan û nîvîsandînê dike. Hin bêtirî wê jî, ew fêri karênu bi destan cêdîbin dike. Tentene, qenewîç, tevî û hwd...



## Di gotinê pêşîyan de rewşa jina Kurd

Gotinê pêşîyan, wek tayê ser mast e; ramanê gelan bi hevokekê ve, wek neynikekê didin ber çavan. Di derheqê hemû baweriyen civakî de tê gotin. Kevneşopa gel, exlaq, adet, fîkr û raman hwd... Di derheqê hemû baweriyen de, bi tehrekî taybeti dikevin nav jîyanê û cîhekî girîng digirin.

Rastiya wan, bi sed salan di nav gelan de hatiye ceribandin. Ji ber vê yekê, baweriyen gelan bi wan wek kelamê xwedê, ayet û hedişan e.

Di vê mijarê de, di gotinê pêşîyan de li ser jinêndan Kurd jî, gelenek tiştî hatine gotin. Rewşa jina Kurd, bi jîyan xwe ya dîrokî û civakî ve jî, di nav gotinê pêşîyan de cih girtiye. Carna mezin dibe, carna biçûk. Car dibe "kêra birabirr" car dibe şer. Car jî dibe bingehiyekî baweriyen.

Ji berê vê, jina Kurd qehremanî û egîtiya xwe li cem mîrê Kurd nîşan daye. Lewre ku gotine.

"Şer şer e, ci jin e ci mîr e."

Belê, ev rast e. Ji ber ku, ji bo welatekî azad û serbixwe jina Kurd, keça Kurd iro jî, di şerê çekdarî de li rex mîrê Kurd û xorîn kurd besdarê vê qehremaniyê ye.

Dîsa gotine:

"Jin hene jinkok hene, qîz hene qîzkok hene"

Cihê jinan wer girîng e ku di hemû kar û bar, gazin û giliyan de bi wan hatiye şêw randin. Lewre ku;

"Gazinê xwe ji jina xwe, gotinê xwe ji diya xwe re bike" hatiye gotin.

Di civaka Kurd de, li ser jina Kurd gelek bawerî jî çêbûne wek: Dayê biwîne dotê lê werîne.

Bextê dê cihêzê qîzê.

Sed bavê çê, esil şirê dê.

Deve ji ku tê? Ji kayê.

Kudik ji ku tê? Ji dewsa dayê.

Ser mezina pê biçûk, xweziya min bi wê malê hatî, tê de bibe bûk.

Di civaka Kurd de, li ser jina Kurd gelek bawerî jî çêbûne wek: Dayê biwîne dotê lê werîne.

Lê belê, di gel vê yekê jî xweşdîtinek pirr mezin jî heye;

"Girtin heq, berdan heq"

Bi cudayî, herdem bandûra xesûyê li ser bûkê tê xuyakirin. Lewre ku tê gotin:

"Buka, bê zar û ziman xesûya, bê dîn û iman"


Baweriyek jî heye ku jina bira, destê birayan ji hevdû dîkin û bê tifâqiyê dixine navbera wan.

"Qizê xelqê kîrê birabirr in."

"Jinêndan mirova dixe şîva gura"

Belê ev gotin û dîtin rastiya xwe nîşan didin. Gelê Kurd tu wextî, ji pirzewacê jî hez nekiriye. Vê yekê jî wiha anîne ziman:

"Şirîk şirîka jîr dike, hêwî hêwiya pîr dike."



Nîkîn ji bo jinêndan Kurd dibêje: "Ew in ên ku baran li dewaran dîkin û jê daffînîn; ew in ên ku avê dikşînin, diçin bêriyê, ard û kom dîkin... Û ew in ên ku zû ciwaniya xwe winda dîkin."

Turan Çabuk



Awayê jiyana me, neynika  
 ramana me ye.

MONTAIGNE

# Hedef ne şexs in lê şexsiyet in!

Min di hejmarên rojnameya Welat ên 14, 21, 22 an de du çirok weşandibû. Çiroka yekemîn bi navê "Komîcivîna konfederasyona Dîkzade û Qumrîzade" û ya du-yemîn ji, bi navê "Eman hawar yeknebin" bû. Çiroka duymîn yanî "Eman hawar yeknebin!" ji ber ku dirêj bû, di du hejmaran de (21-22) hatibû weşandin.

Ji bo ku ez alîkariya xwendevanan bikim, ez dixwazim bi kurtayî çend gotin li ser naveroka van çirokan ji bibêjim. Di van herdu çirokan de, li ser du problemen hin muhacirên Kurd ên li Ewrûpa, ku piştî 12'ê Îlonê ji welêt der ketibûn, hatibû rawestandin. Di çiroka yekemîn de temaya (mijara) esasi komeleyên Kurdan ên şiklî ne. Yanî rexne li komeleyên ku endamên wan, salê carekê hevûdu nabînin, komeleyên ku heger dewlet rojekê alîkari nedî, nikarin bijîn; komeleyên ku navê wan heye, lê ew bi xwe tune ne; komeleyên ku bi dehan navan li xwe dîkin, lê di çalakiyekê de nikarin 5 kesan bâ-nin ba hev; komeleyên ku bi her awayê ji welêt û têkoşîna welêt dûr ketine, komeleyên ku bi pirs û problemen muhacirî re ji mijûl nabin û komeleyên ku tu kesi temsîl nakin, lê, xwe berpirsiyare

her tiştî dibînin, hatibû girtin.

Çiroka duymîn ji, li ser pîrsa "çêkirina partiyen li Ewrûpa" bû. Ev 10-12 salen dawî li Ewrûpa ji çend mehan carekê 2-3 kes tê ba hevûdu û Partiyekê (!) çedîkin û bi belavok an ji deklerasyonekê (!) ilan dîkin. Di navê de mehek derbas nabe Partiya xwe belav dîkin. Du meh sün de eyî mirov, içar bi çend mirovan zêde yan ji kêm, partiyekê din çedîkin. Demekê sün de, dest bi çêkirina ya din dîkin. Û ya kevin belav dîkin. Carna ji partiyê, berî ku ilan bikin belav dibe. Salê çend partî bi vî awayî têne damezirandin û xerabkirin. Belê, di vê çirokê de ez li ser vê pîrsê rawestiyabûm û min xwestibû sedemîn vê fenomena xerîb, deynim holê.

Helbet qehremanen her çîrokê li gora karê xwe ne. Van karêne ciddî, insanen ne ciddî dîkin. Mirovek ku hinek durustî li gel wî hebe, beşdariya kar û barêni wiha nake. Gelek mixabin qehremane çîrokên min, insanen dakte, insanen dejenere, insanen ku bi tu awayî ji jiyana xwe tamîn nebûne, insanen alkolist in, nexwes û kriminal in.

Wekî ku me got, ev giş qehremanen çîrokê ne. Yanî insanen bi vê huviyetê û şiklî, di rastiyê de

tune ne. Yanî weki şexis tune ne, lê weki şexsiyet hene. Ev, hin tipen civata Kurdan in. Û dikarin di hin civatê din de ji hebin. Em bibêjin, weki Evdilzinar Qumrîzade bê hesab insan hene. Evdilzinar Qumrîzade şexsiyeteke çawa temsil dîke? Evdilzinar tipêki riyakar e, ji jiyana civakî û kollektif dûr e. Ne sosyal e. Ji xeynî xwe, ji kesi din hez nake. Zikres e, hesûd e. Şexsiyeta wî tekamûl nekiriye, kompleksen wî, wî dixwin. Ji ber vê yekê ji, divê xwe zana, kérhatî û zirek bi-hesibine. Lî, bi xwe ne bawer e, ji bo vê ji divê hertim xwe bis-pêre hinekan. Di siya hinekan de xwe rehet û bi hêz his dîke. Bi mîjî û ramanen hinekî din, incax dikare biji. Xeyal û xewnîn wî ji, ne yê wî ne. Herwiha tipen weki D.F. Murad ji pîr in. Ev rastiyen civata me ne, li der û dora her D.F. Muradî, çend kes Evdilzinar Qumrîzade hene. Jixwe heger Evdilzinar ewqas pîr nebûna D.F. Murad ji, nikaribûn bijîn.

Nîha hûn dê bibêjin, xêr e, tu çima behsa van çirokan dîke? Mirovekî bi navê Vahap Kumruaslan bû sebebê vê nîvîse. Vahap Kumruaslan li ser van çirokan nîvîsekî nîvîsandîye. Weki ku ji nîvîsa wî tê fîmkirin ew, xwe nîvî-

## Girtiyê plaka erebê


Xortekî Polonî, bi serdanî (ziyaretî) diçe Tirkîyê, ji ber herfîn plaka ereba xwe tê girtin. Weke ku me hemûyan bi-hist ku carekê lempayen trafikê li gelek bajaran hatin qedexekirin, ji ber ku kesk û sor û zer bûn, ew ji, ji ber ku rengê ala Kurdistanê bûn. Lî, xortê Polonî ne ji ber ku di lempa sor re derbas bûbû hate girtin, ne ji tu sûcê wî hebû. Sûcê wî ev bû ku ji bajare Piyotirkof 0 kilometir başûri Warsoye ye. Sedem ne tenê navê bajar e, lê belê ji ber ku hingî erebe pîr bûne êdî herdu tipen plaka ereban gihîstine KK ê, vê carê tipa pêşin ya bajêr P, û tipen din ji KK ne, dibe PKK. Ji ber vê yekê xortê Polonî rojekê di nezaretê de dimîne, heyânî ku meselê bi polisê Tirk dide fîmkirin, êdî ew ji bi konsolosa Polonî re dikevin têkiliye, hêja wî serbest dîkin. Ev bûyer di havîna vê salê de (1992) çebûye. Her wiha xortekî xwendevan hate Almanyayê, ji wî bajarı bi xwe bû û herfîn plaka ereba wî ji her PKK... bû, ji vê yekê, qet zehmetî di naskirina Kurdan de li Almanyayê nekişand, ji ber ku her kesi jê dipirsî: "Ma tu Kurd i?"

Sefkan

kar dihesibine. Vahap Kumruaslan bawer dîke ku, Evdilzinar Qumrîzade ew e. Ji ber wê bir û baweriya xwe, rabûye di kovara Armancê de ji bo vê yekê nîvîsekî nîvîsandîye. (Binêrin Ar-manc, Tebax, 1992) Vahap Kumruaslan di nîvîsa xwe de, bi şeweyekî bê edeb û hîsterik dev davîje der û dorê. Ez dê hewl bîdim da ku nekevîm sewiya wî vê bûyerê zelal bikim.

Li vir tiştîkî xerîb heye. Dibe ku li dînyayê kesi tiştîkî wilo nedîbe. Yek, çîrokekê dinivîsîne, yekî din ji, ji ber ku xwe dişibîne qehremane wê çîrokê û ji bo wê ji radibe, heqaret li nîvîskarê çîrokê dîke. Mirovek wiha di civatê din de bin, tu kes ji xwe nîvîsen wan çap nake, di ser de ji, wan digrin binê müşahadê, ku zîzar nedîn yekî din. Çunki her nîvîskar li gor xwe, hin tipen diafirine. Û ev tip, li civatê hene. Dikarin bişîbin gelek kesan. Evdilzinar Qumrîzade ji di civata me de hene. Hem ji bi sedan. Heger Vahap Kumruaslan xwe bişîbine Evdilzinar Qumrîzade ev pîr pîrs wî ye, ne ya min e. Neticeya ku ez, ji vê bûyerê der-dixim ev e: Min tipêki baş afiran-diye ewqas baş û berbiçav afiran-diye, ku hin kes derdikevin û dibêjin: "Te çîma behsa me kiriye?"

Tipen wek Evdilzinar Qumrîzade bê kér û genî, riyakar û xulam, ji civatan re tu fêde nayînî. Ji bo vê yekê ez dixwazim şexsiyeten wilo deşifre bikim. Civata Kurdan divê bê zanîn. Ez neba-wer im ku min, bi her awayî Evdilzinar daniye navê. Divê mirov li ser van tipen hin ji serê xwe bişîne û bixe-bite. Rewşa wan a ruhî hîn baştı fam bike. Der û dora wan tipen baştı binase. Zanibe ka pirraniya Evdilzinaran, ji kîjan kategoriye civata Kurd tê. Tesîra dê, bav û malbatâwan, tesîra dewleten kolonyalist li ser wan ci ye? Ez bawer im, heger mirov li ser van tiştan ji, hînek kar bike, şexsiyeta Evdilzinaran wê baştı bê nasîn. Tenê bi vî awayî mirov dikare, ji Evdilzinan re alîkari bike. Çaxa ku Ev-



J. Diyarbekirî

Dibistan vebûn. Bi milyonan zarok dest bi dibistanê kirin û bi zimanê xwe dixwînin.



Zaroknal Hün hêviya me ne

# Lê zarokên me?..

**Navenda Nûçeyan-** Gelo tu milet, tu xelk heye ku, zimanê wî qedexe be, dibistanen wî tune bin, zarokên wî bi zimanê miletekî din perwerde bibin, bibin biyaniyê zimanê dayika xwe.

Ziman himê netewebûnê ye. Mirov bi zimanê neteweya xwe dibe parçeyek wê neteweyê. Di dibistanan de, perwerdebûna bi zimanê zikmaki, destpêka endamiya neteweya mirov e. Lewra himê vê besdariyê di dibistanan de, tê dânnî. Weki din, perwerdebûna bi zimanekî biyanî, mirov ji hemû rûmeten neteweyî dûr dixîne.

Dewleta Tirk, bi qedexekirina zimanê Kurdi re, dibistanen ku li Kurdistanê vekir, weke navendêna asimilasyonê bi kar anî. Di van navendan de, zarokên Kurd, ji ziman, çand û hemû rûmeten neteweya xwe dûr diketin. Hin ji

van zarokan, ji herêmên xwe dûr, di dibistanen bi razan (yatî) de, perwerde dibûn. Di van dibistanan de, wilo dikirin ku ev zarok ji neteweya xwe nefret bikin û Tirkbûnê wek rûmeteke herî bilind bibinin. Dema ev zarok dihatin malen xwe, ji dê û bavê xwe şerm dikirin, gelek caran ji, zimanê xwe yê zikmaki ji bir dikirin û di nav wan û xelk û malbaten wan de, tu têkili nediman. Edî ew dibûn lawen Atatürk û bi Tirkbûna xwe şa dibûn.

Belê, iro ev pêvajoya asimilasyonê, bi pêşketina têkoşina neteweyî re, berê xwe daye xwediyê xwe. Bi têkoşina neteweyî re, ziman ji, di nav şoreşke bi rûmet de ye. Iro gel hemû rûmeten xwe, ji nû ve kifş dike û li wan xwedî der dikive.

Bi van pêşveçûnan re, dewleta Tirk, Kurdistanê bi hêzên leşkerî dagirt. Bi teroreke hov

dest bi qirkirina gel kir. Wan dibistanen ku, ji bo tunekirina gelê Kurd ava kribûn, iro bûne gerekol.

Edî ev dibistan (gerekol) bi awayekî din, ji bo tunekirina gelê Kurd tên bikaranın. Belê tu gel, bi qirkirinan nehatiye tunekirin. Dê gelê Kurd ji van qirkirinan, jiyaneck nû û serbixe biafirine.

Zarokno! Hün bê dibistan nîn in. Iro jiyana li Kurdistanê, ciyayê welatê we, dibistanen herî bilind in. Bila dewleta Tirk, wan dibistanen asimilasyonê bike qerekol, bila terorê, ji xwe re bike kar. Lê dê nikaribe bibe asteng di riya perwerdebûna we de. Lewre hûn li dibistanen herî bilind dixwînin. Tu dibistan weke ya we, nebûye sebebê evqas guherandinê girîng. Hün di niya serxwebûnê de, niwêneren jiyaneke nûjen in. Hün hêviya me ne.

rehet nahêle. Her roj Melazgirî tên girtin û li wan işkence tê kirin.

Roja ku Demirel hate Melazgirî bi sedan kes hatin girtin. Kesên girtî, bi hefteyan di bin işkencayan de man. Ev girtin hê ji dom dikin, qefleyekê berdin, qefleyeke din dignin. Bi kurtî bi tu awayî dewlet bela xwe ji Melazgiriya ber nadî. Lê li hember vê zordariyê roj bi roj Kîna dilê gelê Melazgirî ji zêde dibe.



Ahmet Türk

## Kongreya HEP'ê

Mebûs, serokên bajaran û endamên meclisa partiyê, di nava xwe de hilbijartinek pêk anîn û Ahmet Türk ji bo berendamiya serokatiya partiyê hilbijartin.

Kongreya HEP'ê dê di roja 19'ê İlonê dê pêk were. Di vê kongreyê de, bernameya (programa) partiyê ji, li gor şertîn hemdem tê guhertin sistema rêveberiyê ji, dê biguhere.

Ahmet Türk, di daxuyani xwe de wiha dibêje: "HEP, weke malbaktek ye. Emê pirsgirêkên partiyê çareser bikin û bi bernameyeke nû der kevin pêş delegeyan û xelkê xwe."

## Zarokên Kurd û jîyan

**Melazgir, Welat-** Weke ku tê zanîn dewleta Tirk, hersal li Melazgirê cejna xwe ya 26'ê Tebaxê piroz dike. Heta çend sal berê, ev cejn, bi besdariya gelê Melazgirê, leşker û Karmendê (memûrîn) dewletê dihate pirozkirin. Gelê Melazgirê, ji ber nezanî û tîrsê besdare vê cejna "Serpîraziya Melazgirê" dibû.

Lê bi xurtbûna hesta Kurdi û bi hêzbûna gerîlayen PKK'ê, ev cejn ev çend sal in, tenê bi hejmareke biçûk tê pirozkirin. Nemaze di 26'ê Tebaxâ ïsal de, herçiqas Serokwezirê dewleta Tirk Süleyman Demirel ji hatibû Melazgirê, ji karmend û leşkerên Tirk û çend kesen xayîn pêstir, tu kes di pirozkirina

wê de cih ne stand. Ew roj hemû esnafen Melazgirê derabê (kepenkê) xwe girtin, şoferañ ji erekben xwe neşixulandin. Bi wî awayî, hem besdarê cejna 26'ê Tebaxê nebûn, hem ji qetliama Şîrnexê û serdana Demirel protesto kiran. Ji ber vê yekê, ji 26'ê Tebaxê û vir ve, dewleta Tirk, gelê Melazgirê

serxwebûn e.

### SERDANA WAN A KURDISTANÊ

Di van du-sê hefteyen dawî de, yek li pey yekî din, hemû rêvebirên dewleta Tirk Kurdistanê "ziyaret" kiran. Ji bo serdanen xwe digotin: "Em bi mebesta guhdañkirin û çareserkerîna pirsîn gel diçin herêmê." Lê, di sefera xwe ya Kurdistanê de piyê wan bi nav gel neket.

Ji Özal bigirin ta Demirel û Cindoruk tenê li qerekol û bargehêne Artêşa xwe gerîyan. Armanca wan ew bû ku moral bidin leşkerên Tirk ên ku li hember gerîlayan şâş û gêb bûne. Serokê Meclisê Husamettin Cindoruk ji leşkeran re digot: "Em bi we re ne, qetliamîn xwe bidomînîn." Di axaftinê xwe de ji parlamenterekî zehftir dişibiya generalekî diktator. Bi rastî, weke ku mamoste Haluk Gerger ji digot: "Pêwist nahe ku derbeyekê leşkerî li Tirkîye çêbibe, ji ber ku hikûmeta Demirel wek rêvebirina leşkerî ye. Rêvebirên hikûmeta koalisyonê wezîfa generalan pêk tînin."

Di 15'ê İlonê de dibistanen Tirkîye vebûn. Ji xeynî zarokên welatên bindest, yê hemû welatan, di demsala payizê de dest bi dibistanê dikin û bi zimanen xwe yê zikmaki dixwînin. Rêxistina ji mafîn zarokan berpirsiyar ya Yekbûna Neteweyan, UNICEF, ji bo perwerdekirina zarokan ev madeyên li jêr, qebûl kirine. Zarok, mafdarê hînbûn û perwerdebûneke li gorî dilê xwe ne. Ger ku ew dixwazin pîrtir tiştan hîn bibin, ne mecbûr in karekî din bikin. Welat û jîyanekî azad û serbixwe mafê wan e û pîrî girîng e ku ew hîn û zana bibin."

Iro, zarokên Kurd ji hemû mafîn xwe bê par in; ne welatekî wan ê azad û serbixwe heye, ne ji li gor dilê xwe dikarin perwerde bibin. Dewletên dagirkir mafîn wan giş, ji desten wan der xistine di ser re ji, wan didin ber fişek û bombeyan. Dixwazin ku zarokên Kurd bê şexsiyet bibin û bibin kole. Nemaze dewleta Tirk, ji bo kolekirina wan ev heftê sal

e, siyaseta asimilasyonê dimeşîne.

Nijadperesten Tirk hê ji, dev ji asimilekirina zarokên me ber nedane. Bes, zarokên Kurd edî ne yê berê ne. Iro, ev siyaseta Tirkperest nema dikare bigîhiye armanca xwe. Erê, hê ji zarokên Kurd ji hemû mafîn xwe bê par in, lê edî bê şexsiyet nabin.

Têkoşina gerîla ya çekdarî bi zarokan me daye zanîn ku maf bi hêvî û lave lavan bi dest nakevin; bi darê zorê tê standin. Ji ber vê têgîhîstinê, iro her zarokekî Kurd bûye wek neferekî azadiyê. Bi hezaran ji van zarokan bûne gerîla, li serê çiya ne û bi sed hezaran ji, li bajar û gundêne Kurdistanê di serhildanan de cih digirin. Ew edî ji mirinê natîrsin û dizanîn ku ne bi têkoşina çekdarî be, maf nayê standin. Ji ber vê yekê, ta roja şoreşê, dibistanen zarokên Kurd ciyayen Kurdistanê; perwerdeya wan ji têkoşina çekdarî ya rizgariya Kurdistanê ye.

Diplomên vê dibistanen ji azadî û

# Dagirker di xwîna xwe de difetisin

**Navenda Nûçeyan-** Welat seranser bûye gola xwînê. Dagirker berê xwe dane sivil û gundiyan Kurd. Roj tune ku, li Kurdistanê gund an navçeyek ji holê ranekin. Lê gerila jî, roj tune ku bargeh an qereqolek leşkeri hilneweşinin. Hêzên leşkeri, di şerê bi gerila re de, tevî hemû derfetên xwe yên leşkeri, nikarin li pê, bisekinin. Ji ber vê ye ku, sivil û gundiyan bê çek dikujin û malen wan talan dikan. Ev heftiya çûyi, bûyerên ku çebûn, ne tenê welat, lê welatên der û dorê jî hejandin.

**1-9-1992:** Li çiyayê Kurdiya Mûşê, gerila rê girtin û 12 cerdevan ji erebeyan daxistin û bi xwe re birin. Ev cerdevan, ji gundê Sêmalê bûn. Berê ji 8 cerdevanen vi gundi hatibûn revandin. Li ser riya Dêrikê otobosek ji aliye gerila ve hate şewitandin. Ev otobos leşkeran dibir û dihanî. Gerila êrîsek bir ser Midyadê. Gerila avahiya emniyetê û malen cerdevan û hizb-î kontrayan bi çekan kutan. Di derheqê kuştî, an jî birindaran de, nûce nîn in. Li Wêranşarê gerila avet ser mala muxbirekî. Ev muxbir ji kuştina gerilayek berpirsiyar tê girtin. Li

gundê Stewrê (Savur) De-riş, melayê gund ji aliye gerila ve hate kuştin. Mele bi hizb-î kontrayan re di tekiliyê de bû. Gerila riya navbera Çıldiran (Çaldiran) û Bazide girt. 3 tir û 2 texsi hatine şewitandin. Gerila 5 kesan ji, bi xwe re bir. Li gundeki Qoserê (Kızıltepe) de nav gerila û leşkeran de şer derket. Di vi şerî de 4 gerila mirin. Serbazek (üsteğmen) û hejmarek zede leşker jî, hatin kuştin. Li Farqînê (Silvan) welatparêzek, ji alî hizb-î kontra ve hate birindarkirin.

**12-9-1992:** Cerdevanek li gundeki Aranê (İxdir) hate kuştin. Li Qoserê (Kızıltepe) 5 endamê hizb-î kontra hatin kuştin, 2 tim ji birindar bûn. Li Sasonê tesisen petrola Şel moye hate şewitandin. Agir hê ji netefiyaye. Di vê bûyerê de, 3 endaze (muhendis) ji hatin kuştin, 7 kes ji birindar bûn. Li Wanê cerdevanen ji gundê Goran bi hev re şer kiran. Cerdevanek di vê bûyerê de, cehimî, yek ji birindar bû.

**13-9-1992:** Li Navşanê (Şemdinan) li hêla Hêrkî êrîsek birin ser qereqola gundê Bêzêl. Qereqol tevî leşkeren tê de, hate rûxîn (îmhakirin). Li ser vê bû-

Soreşgeri awayekî jiyanê ye. Ev, jiyanekî bi rûmet e. En di vê jiyanê de cihê xwe digirin. Riya mirovahî yê ronahî dikan.

yerê hêzên dewletê dest bi operasyonek mezin kiran. Ji gerila jî zayıfat heye, lê hejmara kuştian nayê zanîn. Li Agirî cemseyeke leşkeri kete kemîna gerila. Di vê bûyerê de, serbazek (üsteğmen) û 3 leşker hatin kuştin, 3 tim û 2 leşker ji birindar bûn.

**Li Nisêbinê sefokê hizb-î kontrayan Nedim Kardeş ji ber ku ji vê rêxistinê vejetiya, ji aliye kontrayan ve birindar bû.**

**14-9-1992 :** Di bûyerâ Navşanê (Şemdinan) de, hejmara kuştian leşkeri, giha 75 an.

Di derheqe zayıfatên gerila de, nûçeyen rast nîn in.



Li Duhokê (Erûh) 7 leşker hatin kuştin. Qereqola Erdişê, ji alî gerila ve hate hilweşandin. Li gundê Mêrdînik (Göle) 2 muxbir hatin kuştin.

Li gundeki Nisêbinê 3 cerdevan û leşkerek pêli mayînê kiran û birindar bûn. Gerila li gundeki Semsûre (Adiyaman) êrîş bir ser cerdevanan, 2 kes birindar bûn. Serokê Belediya Şêrwanê (Şirvanê) û karmandekî belediyê li hêla Malabâdê (Farqîn) hatin kuştin. Di vê bûyerê de, Serokê ANAPa Şêrwanê ji birindar bû. Ev kes ji Diyarbekir, ji civîna ANAPê vedigeriyan. 13 cerdevanen Hezo (kozluk) ji aliye gerila ve hatin kuştin 2 cerdevan ji, birindar bûn.

Ev cerdevan ji standina pereyên cehşîtiyê vedigeriyan. Li ser riya Norşen û Mûşê, li hêla Dêrxasê, cemseyen leşkeri ketin kemîna gerila û îmha bûn. Di derheqe kuştian de nûce nîn in. Li gunde Hekari Elkîk, gerila êrîş bi ser cerdevanan û cerdevanek kuştin, yek ji birindar kiran. Li Diyarbekir, hizb-î kontra Selehattin Tarım kuşt, kurê wî ji (12) birindar kiran. Qoser (Kızıltepe) şina gerila digire. Li Qoserê, ji bo 5 gerilayen ku hatine kuştin esnaf dikanen xwe girtin

Li Farqînê Medeni Arslan, li mezraya Çinarê Qorgun Cahide, Şeyhîmus û H. Ali Kaya, li Qoserê Ahmet Arıkan, li Nisêbinê Şemsedin Aytemur ji alî vê hêza tarî ve hatin kuştin.

## Têjikên Atatürk li ser kar in

**Navenda Nûçeyan-** Di heftê meha ïlonê de, li navçeya Mêrdînikê (Göle) ya Ardahanê, hêzên dewletê qetliamek mezin çekirin.

Di heftê mehê de, di navbera hêzên dewletê û gerilayen de şerek der dikeve. Di vi şerî de 18 gerila tenê kuştin û 4 ji bi saxîti têne girtin. Lê, hêzên dewletê her çar gerilayen ji didine ber gulan û paşiyê ji bi tanqan di ser wan de diçin. Dû re cendekan (cesadan) dixine romorqekê û li nava Mêrdînikê de digerînin. Nişanê gel dikan da ku gel bi vê hovîtiyê bê tirsandin û qutifandin.

Piştî vê yekê hemû cendekîn gerilayen ji hêla belediya Mêrdînikê ve, di çalekê de tê binax kiran.

Bi pêhisandina bûyerê ve, komele û rêxistinê demokratik li hember van kîrinên dewletê bêdeng neman. Hinek komel û rêxistin, li cihê bûyerê leşgerin û vekolînên xwe pêk anîn. Komeleya Mafê Mirovan ya bajarê Qersê

li cih leşgerin pêk anî û raporek amadê kir. Heyet di daxuyaniyê xwe de dibêjin: "Emê raporê bişinin gelek komel û rêxistinê Navneteweyî, mîna, rêxistina Komîsyona Mafê Mirovan, Komîteya Çavdêri ya Helsînki û balyozxanen (qonsolosxaneyen) biyanî û hwd."

Rojnameyên burjuwazî tenê, kuştina gerilayen mîna her car dan. Qet li ser qetilkirina wan nesekinîn. Helwesta xwe ya berê her di domînin û hovîtiya dewletê diparêzin.

Ev qetliam û hovîti bi pêşniyara waliyê Ardahanê û serleskeren alahiya Mêrdînikê tê kîrin. Hêzên dewletê ne tenê rayedarên leşkeri her wiha yên sivil ji, bi kîrinên xwe didin nîşan ku, bi tu awayî ji Naziyan kîmtir nîn in.

Ma Hitler ji bo Atatürk negotibû: "Bavê min ê ramanî (fîkrî) Atatürk e." Hovîtiya ku têjikên Atatürk dikan, ji yên hemû faşîstan zedetir nîne ci ye?

# PÊNÛS



Amed Tigris

## 'Sal bi sal xwezî bi par'

Li welat, li gund û bajârên biçûk xelk her sal tedarika xwe û zivistanê dike. Ji havinê ve rûn, qeli, savar, tene, dan, ard û hwd. berhev dikin. Pirraniya xelkê ji dawiya payîzê heta dawiya biharê ji gund û malen xwe dûr nakevin. Bi rojan li ser banî û li nav gund lîstikan dilizin. Di şevê zivistanê yên dirêj û tarî de ji, diçin şebihurikan û çirokan dibejin. Stranan davêjin ber û ser hevdu. Xort qirdikan çedikin.

Siyasetvanê me yên muhacir ji, tam 12 sal in, ku li derê welat wek wan gundiyan welaş yên me her havin tedarika nefeqe û qutê xwe yên siyasi dikin. Havinê diçin tatilê. Baş xwe didin ber tavê û bêhna xwe der dixin. Paşî ji çend kes tê ba hevdu û kongreyê xwe çedikin. Vedigerin tê Swêdê û bi belavokê xwe yên bi Kurdi û Tirkî kongrê xwe ûlan dikin. Her sal di van belavokê xwe de ïdia dikin ku yekitiyeke mezin û bi hêz çêkirine. Bingehêne yekitiyê wan li ser axa welat pêk hatiye. Lingêne xwe li welat bi şidî dane erdê. Li welat bi hezaran kesen militan ketine nav ref û hêzen wan. Bihara ku bê dê yekitiya wan dengek

**Her sal kongreyê xwe li Ewrûpa çedikirin, lê îsal bûye mode yek bi yek diçin li Başûr çedikin. Ji niha ve dest pê kirine û belavokê yekitiyê xwe li Stokholmê belav dikin.**

gelek mezin der bixe. Bi hezaran mirov dê rabike ser piyan... Bi van belavok û nûçeyan re li derê welat, dest pê dikin pêşî diçin mala wan hevalen xwe yên ku westiyane û dev ji wan berdane. Pêşî wan ziyaret dikin. Belavoka xwe berpêşen wan dikin û ew dawetê nav refê yekitiya nû ya bi hêz û mezin dikin. Qasî çend mehan vê carê daxuyaniya kongre, destûr û programen xwe yên nû li hevalen xwe belav dikin. Çend mehan ji, bi wan tiştan der û dora xwe ûdare dikin. Dor tê ser derxistina kovareke nû. Wek ku bênen do-pingkirin, sê çar hejmar li pey hevdu der dixin. Ji serî ve dest pê dikin û gotubêja (munaqesa) "ji me re partiyekê çawa divê" dikin. Bi van nefeqe û qûtan xwe digihînin heta serê biharê. Mala Swêdê xopan bibe, zivistanen wê hema geleq dirêj in hal! Nefeqe û qûtan her partiyê têr nake ku xwe bi xêr û xweşî bigihînin biharê. Herwiha yên jar û qel nagihêne biharê, yên qelew ji hema hema xwe bi çarpelikan digihînine bihara Swêdê. Bi biharê re riya welat vedi-be. Tu deng ji xebata wan a welêt der nakeve. Moralen hevalen wan ên berê carek din dibin wek aşê xerabe. Dev ji partiyen xwe ber didin. Hema hema her kes dibe serbixwe. Madem ku serok bi xêr û xweşî gihîştine biharê, divê tiştan nû çebikin. Bi havinê re, serok dîsa der dikevin derê Swêdê li ser yekitiyê qise dikin. Serokên kevin tê ba hev û dest bi munaqesa yekitiyê dikin. Carek din du sê kesen cuda û serbixwe tê ba hevdu û yekitiyeke saxlem çedikin û paş ve tê Swêdê.

Tam 12 sal in ku ev çerxa yekitiyan wiha dizivire. Kêmbûn û kêmbûn... Bi hezaran dest pê kirin, salek dû re bûn sed. Salek din bûn deh û niha ji bûne didu-didu... Hatîn ber qedandinê. Gotineke pêşîyan heye: "Sal bi sal xwezî bi par."

Dibêjin ku yên mayî îsal hemû hatine ba hevdu, lê nikaribûne 12 kes temam bikin. Lê, dîsa ji, taybetiyeke kongreyê îsal hene. Her sal kongreyê xwe li Ewrûpa çedikirin, lê îsal bûye moda, yek bi yek diçin li Başûr çedikin. Ji niha ve dest pê kirine û belavokê yekitiyê xwe li Stokholmê belav dikin.

Ez hêvîdar im ku ew, dîsa îsal bi xêr û xweşî xwe bigihînin biharê. Te dît par li Skandînavyayê zivistan xweş û kin derbas bû. Lê, dîsa bi zor û bela xwe bi belavokê polt buro û komîta merkezî gihadîn biharê. Gelo heger îsal li Skandînavyayê zivistan dirêj bajo, dê nefeqe û qûtan wan têr bike? É madem ku îsal li Başûr civînên xwe çêkirine, wê çaxê tedarika zivistaneke dûr û dirêj ji kirine!

# 'Kurmancî' ya Enstituya Kurdi ya Parisê

Amed

Kurmancî kovareke ku li ser kira Enstituyê, rastir li ser a Kendal Nezan, derket. Armanca wê ew e ku xebateke zimanzi li ser zaravê Kurmanciya Jorîn bike. Di warê kareki wiha de, em çêtir dibînin'ku nêrîna nîviskarê welatparêzê bêhempa, Apo, nîşandin "îro, vejandina wî (zaravê Kurmanciya Jorîn - Amed) hewceyî xebateke tevahî û xweser e. Ji bo pêşvebinra vî zaravê fireh û dewlemed xebata gelek kesen jîr, serwext û bîrbir divê (...). Divê xwendayên Kurd zimanê xwe ji nezaniya nezanan, çepeliya birbiran, qurretiya xwedibinan bi-parêzin. Ev celeb kes, dikarin zimanê me yê delal û şérîn bikin tîrşik, wekî rewşa me ya siyasi yekcar bê merês bikin û ber din (...).

Divê em qedrê bîradêrên ku di Kurmancî de xebat kiri-ne bigirin û divê em xwe ji ser a rast re ji derbas nekin. Ev mesela ku sernivîskarê Kurmancî dinivîsin "ji bakur ta başûr, ji rojhilat ta rojavayê navçeyen Kurmanciâxêvén Kurdistanê besdar hebûn" (2), mebest jê ew e ku bi van peyvîn kîrsekane Kurmancî mezin bikin û valahiya neweşandina Hêvî, Studica Kurdi-ca û Bultenê pê tîjî bikin. Em yekê dibêjin yekê nabêjin. Mirov ne li dijî tu xebatê ye, lê mirov rexneyen şeweyen pêkânia wê divê bike.

Kurmancî di her sê hejmarên xwe de giraniya xwe da ye ser çalakiyê Enstituyê yên rengrengî. Mesela nasandina doza Kurdi, navkirina kovarê bi Kurmancî û derbaskirina çarçova xwe, em bidin aliyeji. Ji iroe, pêwistir e ku zimanê me wekî Kurmancî bi xwe dibêje nebe "wekî zimanê Irlandî, Welşî û Brotonî" (3), lêkolin, têbinî, nêrîn û pêşniyarên li-ser zimanê kurdi werin amadekirin, pê dengkirin û belavkirin. Ez dikarim bibêjim Kurmancî ji rexnan re "vekirî" ye û ne vekirî ye. Ne vekirî ye çima ku ji destpêkê de çarçova kovarê ev e: 4 rûpel ji çalakiyê siyasi û dengûbasen Enstituyê re û 4 rûpel ji xebatê ku van birade-

ran di nava 6 mehan de dîkin re ye. Bi gotineke dinê, ji van du babetan derbas nebûye. Ne xwendevanekî bi nîviski rexna wan kiriye û ne wan ji rexna xwendevanekî kiriye.

Ji aliye din ve, Kurdêñ-zaravê Kurmanciya Jêrin, bi daxewa, ji sedema alfabye ,nikarin

nin), wekî berxên sernerm li hêviya kêra quesab (nemînîn) (5), ez şeweyê xebatê hane dibînim:

1. Kovar ne Kurmancî be, kurdi be. Di kurdi de, mirov hîngê dikare -eger bixwaze-beşen zaravan ji hev cuda bike, mîna Hêviyê.

2. Civîna fireh, eger ne ji gişan re bila ji pirraniya bende-warê zimên re bin, ci Kurmanc bin, ci Soran bin, ci Zaza bin û hwd.

3. Herweki di van civînan de, nêrîn û têbîniyê cihê wê der kevin, hîngê mirov, ji bilî encamên van civînan, wan nêrînan jî belav dike. Bi tonekî dinê, ev civîn li gora rewşa me, wê nebin û na-be bibin "ayetên Quranê".

4. Mesele ji roja iro re ne tenê besdarbûn e di van civînan de, wekî din bendewarê zimên dikarin lêkolin û xebatê xwe yên zimanzi amade bikin û di kurdi de belav bikin.

5. Li gor rapora direktörê Enstituyê, Kendal Nezan, 25 ra (ta) 30 hezar, F. firesizî li mesrefen cûn-hatinen van camêran dike, û 6 hezar F; firesizî li çapkirina Kurmancî dike (6). Bi vê mesrefa evqas giran mirov direkto pirraniya bendewarê zimên vêxwîne Parisê, li malen Kurdan bi cih bike û civînên xwe li avahiya Enstituyê ya fireh bike.

(1) Apo, Berbang, hejmar 5.1982, Swêd, rûpel 9.

(2) Kurmancî, rojnameya taybeti ya Enstituya Kurdi ya Parisê li ser pirsên zaravê kurmancî, hejmar 3, havin 1988, rûpel 1.

(3) eyn serçavik.

(4) Kurmancî, rojnameya Enstituya Kurdi..., hejmar 3, havin 1988, rûpel 1.

(5) Kurmancî, ..., hejmar 1, havin 1987, rûpel 1.

(6) Li rapora moral a Civîna Gelemeperi ya sêyemîn a Enstituya Kurdi, 17-18 berçile, 1988, çapa frensizi, rûpel 16, rez 36-40, binere.

Têbinî: Ev gotar ji Kurmancî re hate nîvisandin ku belav bibe. Bi awayekî fermî Kendal Nezan, Mehmet Uzun kiriye berpirsiyare wê. Bêyi ku nêrîna wî bistîne Kendal Nezan rabû bersiva nebelavkirinê bi şewekî "mentiqî" da min.

H E S P		
Kurdî	Îngîzî	Fransîz
1-28 hep	af	horsehead
1-11 torî	dag	tail (in the cheval)
2-10ma, sinde	perçen	tail (in the cheval)
3-ent	ent	front
4-çîr	çîr	hindquarters
5-7a	7a	hind
6-dîn, poz	tezur	hindquarters
7-7ma	7ma	hind
8-îla, pri	îla	hindquarters
9-der	der	hindquarters
10-îla, û	îla û	hindquarters
11-çîr, apî, apîk	çîr	hindquarters
12-pash	pash	hindquarters
13-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
14-çîr, apî	çîr	hindquarters
15-çîr	çîr	hindquarters
16-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
17-nemî	nemî	hindquarters
18-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
19-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
20-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
21-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
22-29 zand	de	hindquarters
23-çîr	çîr	hindquarters
24-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
25-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
26-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
27-çîr	çîr	hindquarters
28-dînem, remînem	dîn	hindquarters
29-nemî, apî	apî	hindquarters
30-nemî, apî	apî	hindquarters
31-çîr	çîr	hindquarters
32-dînem, remînem	dîn	hindquarters
33-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
34-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
35-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
36-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
37-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
38-dînem, remînem	dîn	hindquarters
39-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
40-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
41-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
42-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
43-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
44-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
45-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
46-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
47-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
48-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
49-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
50-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
51-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
52-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
53-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
54-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
55-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
56-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
57-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
58-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
59-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
60-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
61-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
62-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
63-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
64-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
65-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
66-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
67-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
68-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
69-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
70-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
71-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
72-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
73-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
74-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
75-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
76-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
77-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
78-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
79-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
80-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
81-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
82-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
83-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
84-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
85-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
86-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
87-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
88-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
89-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
90-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
91-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
92-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
93-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
94-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
95-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
96-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters
97-çîr, apî	çîr, apî	hindquarters

Folklorê Xosorê ra:

# Luyi nêbena embaz

**Maruf Y.**

Hêkki bi çinê bi pirêka o-caxkori bivî, ya û şo tewer (teber) û xu (xwi, xo) rê bigêro avladêki.

Ya koti rayi ser, tê (tay, tikêkî, biney) şiyi rastê heşkî amî.

Heşî va:

- Ti û (ku, do) şêrê ça pirê?

- Ez û şêrê tewer, semê ki xu rê ewladê vini û biyari keye xu.

Heşî piri ra va:

- Ma ti nêxwezena mi xu rê berê bikê ewladê xu.

Piri tê vinete û va:

- E, sarî û çimonê mi sera, teniya ki ti vajê "e."

Heşa min û to zê (zey, hezey) gê (ga) ora û pencê xu dê verê bino ro (pencê xwi day yewbînan ro).

Pira min û to tersay û va:

- Nê, ez to nêwezena û i-

na zî rayi xu di şiyî.

Tê şiyi rastê vergêki zî amî, vergî va:

- Ti û şêrê ça pirê?

- Ez şîna tewer di gêrena ewladêki.

- Vergî piri ra va:

- Ma ti nêşkena mi xu rê bikê ewladêki?

- E, êşkena qevul bikî, çirî nêşkena, teniya ki ti qevul bikê.

Vergê min to zi zê heşî ora zura (zira),

Piri tersay û va:

- Nê, ez to nêwezena.

Û bi ters koti rayi ser. Tê şiyi rastê luyiki zi amî.

- Luyi piri ra va:

- Ti û şêrê ça, pirê?

- Ez û şêrê tewer û xu rê ewladêki bigêri.

Luyi ya ra va:

- Ma ti bawer kena ki ez to rî bena?

- E, ez bawer kena, teniya ki ti qevul bikê.

Kêfê luyi ame û piri ra va serî û çimonê mi sera, ki ti mi biwezê.

Luya min û to destê xu dê werê binono (destê xwi day yewbînan ro).

Rojo ewwilî luyi hema bizê ya werdê, rojo diyine hema kergê ya werdê, rojo hîrine tatur û qormê ya werd.

Şon di pira min û to amî kiye û va:

- Erê ho çâ dewar mi, ho çâ tatur û qormê mi?

Luyi va:

Postê ho serê boni di sere ho axor di vêrê ho koxê ker-gon di.

Seyi (senê) ki luyî ìna va pira min û to gina er ro û merdi.

**KÊNÊ MÎRÊ PÊÇARÎ**

Hêkki bi çinê bi mîrêki bi kênêkyâ yî biwî. Nomê ya Fatiki bi.

Ya kênêka pişipili û bêarî



bi. Û zaf zi rindi bi, ki merdimî rindiya ya ra nêşkîni bonû tar.

Feqet ya hertim ciddî bî, ki qet nêhiwena û ìna zî pişipili bî heme çîra zî vatêni nê. Yewî ra zi hes nêkerdini.

Sedemê ena yewi ra Mîrî qa-sidonê xu şiraveno (erşaweno) "peçar" û yêni ra vono mellonê peçarî ra vajêni mîrî vato:

"Şima se kernê-bikêni, şima gere kênê mi hiwayîş bidê (bidî hiwayîş). Hindî ya kîye di men-da, yew ya nêwezeno. Se-demê ki ya nêşkerna bihewa, yew ya nêwazeno, ya hindî keye di menda, bîya pîri.

Sedemê ena yewi ra hemini ra vajêni "kom kênê mi he-wayîş bido, ez û (ku, do) him kérê xu bidî yî û him zî yî biki Mîrî peçarî." Heme cara mellê amebî, seyin (senê) keyna çim gina yeni ro, xu kerd qure.

Yêni ker nêker nêşkerdi ki ye hiwayîş bidê. Mellêki monê (mîyanê) yêni ra hêdî-hêdî üris ve (wariş pay) û şî keye û kişteka her-dişa xu kerd tira û seyî ki a-me û keyna çim gina yî ro pozi hewa.

Min nê estanîkî zey vatişdê yew Xosorijê nuşti. Xosor yew dewa Licê ya.

rekan sererast bibe. Bi vî halê xwe film der nekeve, li gora min wê çêtir bibe. Pirek û keçikênu ku bi kurdi xweş zanibin, dengdana filmê Mem û Zînê çêkin, wê çêtir bibe.

Gelek xeberdanê film jî ne li gora qaîdêñ zimanê kurdî ne. Tama wergerandînê ji xeberdanê tê. Yanî mirov dibêje qey bi tirkî ni-vîsine û wergerandîne kurdî. Em ci zanîn, dibe ku berê bi tirkî ni-vîsandinbin û wergerandîbin zimanê kurdî. Lê em karin bibêjin ku ev ne tiştekî rast e û ne tiştekî xweş e. Wek ku me got, ji film, tama tirkî tê. Ji kurdiya film, yanî...

Kurmanc dibêjin: "Pisik ne li mal e, mişk Evdirreh-man e." Ez bawer dikim wê li pêsiya me, gelek filmen bi kurdi çêbibin. Wê gelek filmen bi qîmet û hêja çêbibin. Lê disa ji em vî filmê Mem û Zîn û xebata, taba ku pê re hatiye dîtin, biçûk nabînin. Ji xwe ku mirov tiştekî ne baş nebîne, nikare tiştekî baş çêbike. Tevi kîmasiyêñ xwe, disa ji filmek ne xerab e. Ez xebatkarêñ film pîroz û ji wan re spas dikim.

## Zimanê filmê 'Mem û Zîn'

**H U S E Y İ N D E N İ Z**

Kurdiya vî filmî çend caran nêri. Zimanê wî, li gorî min ne zelal e. Min çend caran lê nêri, lê disa ji min, ji gelek

peyvîn listikvanan tiştek fêm nekir. Xasma ji, ji peyvîn listikvanen pîrek... Xeberdanen pîrekên vî filmî, ne

zelal in. Nayêñ fêmkirin. Ge-lo çîma xeberdانا wan ne zelal e û bi hêsanî nayê fêmkirin? Li gorî min, keçik û pîrekên ku deng dane film, baş bi kurdi nizanîn. Mirov kare li gora xeberdanen wan, ku di film de dikin, bi hêsanî bibêje, ev keçik û pîrek bi zimanê kurdi nizanîn. Xeberdanen wan, wek kesen ku Tirk bin û ji nîvisandinê, xeberdانا bi kurdi dixwînin. Zimanekî çêkirî (sûnî) di devê pîrekên filmê Mem û Zînê de ye. Hem zimanê wan çêkirî ye ku deng dane film, û hem ji Mem û Zînê herimandine.

Xeberdانا Musa Anter, Mem, Tajdîn û listikvanen zilam, ji ya pîrekân paqijit e. Li ku derê welêt be, bila bibe, ez bawer dikim wê Kurd tev de ji xeberdanen wan fêm bikin. Kesê ku dengê zîlaman dane film, ez wan pîroz dikim.

Ku bi kurdi ev film pîrek bibe û bê belavkirin, divê zimanê listikvanen keçik û pî-



'Sahneyek ji filmê 'Mem û Zîn'.'

# Cemiyeta Teavûn û Terakî ya Kurd

(*Komeleya piştgirî û bilindbûna Kurd*)

**Armancê cemiyetê, ji bernameya siyasi, ya contirkan pirr guherandî nîn bû. Kadroyen cemiyetê, di refen İttihat û Terakî de, siyaset meşandibûn. Li Kurdistanê vebûna dibistanan ji bo Kurdistanê, tayînkirina karmendên Kurd, pejirandina zimanê Kurd, di avahiyê fermî de, temsîlkirina mebûsên Kurd di Meclis-i Mebûsan de, di warê aborî de, bi pêşketina Kurdistanê, avakirina rê û dibistanan, dawîlêanîna bertîl û zilma zaptiyan ku li ser gundiyan Kurd dimeşandin, bernameya cemiyetê bû.**

## Ismail Göldas

Nûçeya damezirandina cemiyetê, di rojnameya Tanîn, hejmarâ 25 İl on 1324 (1908) de, hatibû weşandin. Tanîna 30 yê İl on, qala hebûna lokalek cemiyetê dike. Li gor rojnameyên Tanîn û Takvîm-i Vakayî, diroka avabûna cemiyetê İl on 1908 e. Malbaten Şemdiyan, Baban û Bedirxaniyan, avakarên vê cemiyetê ne.

Armancê cemiyetê, ji bernameya siyasi, ya contirkan pirr guherandî nîn bû. Kadroyen cemiyetê, di refen İttihat û Terakî de, siyaset meşandibûn. Li Kurdistanê vebûna dibistanan, ji bo Kurdistanê tayînkirina karmendên Kurd, pejirandina zimanê Kurd di avahiyê fermî de, temsîlkirina mebûsên Kurd di Meclis-i Mebûsan de, di warê aborî de, bi pêşketina Kurdistanê, avakirina rê û dibistanan, dawîlêanîna bertîl û zilma zaptiyan ku li ser gundiyan Kurd dimeşandin, bernameya cemiyetê bû. Di nav wan de, yên ku bername û mantiqa van organîzasyonan ji tesbit dikir. Belê ev qadro Kurd bûn, lê bernameyeke wan a serbixwe tune bû. Di nav wan de, yên ku bername û programke serbixwe ji dixwest hebûn. Welatparêzân Kurd Xelîl Xeyali, Mîri Kâtîpzaðe Cemîlî Diyarbekirî, Kurdiżade Ehmed Ramîzê Lîcî di nav van de, kesen herî bi nav û deng bûn. Armanca cemiyetê Kurdistaneke serbixwe nîn bû. Babanzade İsmâîl Heqî Beg, ku dawî ket parlamentoa Osmanî, di derheqê armancê cemiyetê de, ji rojnameya Kurd Teavûn û Terakî re, beyaneteke wiha dabû: "Ev qewmê paqîj, berî her tiştî Islam e. Piştî wê jî, sebebê hebûna muslimanan û destpêka berxwedariya dînyayê di çarçoveya meşrûtiyetê de, Osmanî-

balyozê Stockholmê Şerîf Paşa û Emîn Elî Bedirxan ji, di nav şexsiyetên cemiyetê de bûn. Van serokên Kurd ên aristokrat, şîara "Osmanîbûn" a Contirkan diparast; ji împaratoriye hîviya meşandina siyaseteke Kurdi jî dikirin. Têkiliyên wan ên bi gelê Kurd re, bi awayekî pederşahî bû.

Dijminatiya di nav eşiran de, bername û mantiqa van organîzasyonan ji tesbit dikir. Belê ev qadro Kurd bûn, lê bernameyeke wan a serbixwe tune bû. Di nav wan de, yên ku bername û programke serbixwe ji dixwest hebûn. Welatparêzân Kurd Xelîl Xeyali, Mîri Kâtîpzaðe Cemîlî Diyarbekirî, Kurdiżade Ehmed Ramîzê Lîcî di nav van de, kesen herî bi nav û deng bûn. Armanca cemiyetê Kurdistaneke serbixwe nîn bû. Babanzade İsmâîl Heqî Beg, ku dawî ket parlamentoa Osmanî, di derheqê armancê cemiyetê de, ji rojnameya Kurd Teavûn û Terakî re, beyaneteke wiha dabû: "Ev qewmê paqîj, berî her tiştî Islam e. Piştî wê jî, sebebê hebûna muslimanan û destpêka berxwedariya dînyayê di çarçoveya meşrûtiyetê de, Osmanî-

yeke xwerû ye, piştî van hê Kurd e." (Rojnameya Teavûn û Terakî 5.11.1908, rûpel 1)

Cemiyet, nebûbû xwediye bernameyeke li gor hoyen Kurdistanê. Hoyen rojane, objektîvîteya împaratoriya Osmanî, têkili û dijberiyen cînî, yên di nav ronakbîr û aristokratên Kurd de, tunebûna perspektîf Kurdayetiye, li ber zayîna bernameyeke wiha, astengên herî mezin bûn. Xwespartina hîkmî İslamiyetê û girêdana seltenet û xîlafetê, hevkariya meşrûtiyetê û parastina sîfeta osmani-bûnê kurte-bernameya cemiyetê bû.

Navenda cemiyetê li Stenbolê li taxa Gedikpaşa bû. Li Diyarbekir, Bedîlîs, Erzirom, Mûş û Mîsûlê ji liqên cemiyetê hebûn. Wan liqen bi navê "Kî û bîn Kurdi" karêñ

xwe dimeşandin. Serokê cemiyeta Diyarbekir, Miftî Subî Efendî bû, liqen Bedîlîs û Mîsûlê di 17.11.1908 an de vebûbûn. Têkiliyên Saïdî Kurdi ji, bi cemiyetê, bi giranî jî, bi weşanên cemiyetê re xurt bûn. Liqen cemiyetê, bi malbat û eşiretenen Kurd re ji têkiliyên germ danibûn. Têkildariya eşiretenen Mûşê bi cemiyetê re, xurt bûn. Nêzîkî 700 Kurd, besdarê vebûna liqê Bedîlîs bûbûn. Ligor hin çavkanyan, xuya dike ku di vê liqê cemiyetê de, komên çekdar, yên bi cemiyetê ve girêdayî jî hebûn.

Hedefa cemiyetê, bi giranî, di nav Osmanî de, bi pêşketina çanda Kurd bû. Hin zengin û eşiretenen Kurd ji, nêzikayî nîşanî cemiyetê didan. Cemiyet bi besdariyek girseyî, li Veznecîler a Stenbolê, lokalek jî vekiri bû. Axaftina Miftîzadeyê Mûşî, ya li ser yekîti, hevbeşî, wek-

hevî û azadiyê balkêş e. Esasî naveroka vê axaftina "Biratiya Gelan" li ser Ermeniyan bû. Lewra, di wan rojan de, navbera Ermenî û Kurdish baş bû.

Avakarê cemiyetê Xelîfe Selîm û Elî Axa, ji serokên berxwedana Bedîlîsê bûn. Vê cemiyetê di bin siya xwe de, kadroyen serokatiya berxwedanê jî, digihandin.

Divê lêkolinênu ku, di dermafê wê demê de, bêne kirin objektîv bin. Kurdayeti bi temamî ne dihat inkarkirin. Belê bernameyeke Kurd ya eşkere, ji bo Kurdish nasnameyeke serbixwe, naverokeke siyasi-karvanî ji bo pêşeroja Kurdistanê tûnebûn. Têkili û dijberiyen civakî-cînî, sewiya civaka Kurd a politik, serokatiya di bin siya eşriyê de, di wê demê de, kaniya hebûn, jîyan û siyaseta van rexistinan bû.



Têkiliyên Seidî Kurdi ji bi cemiyetê re hebûn.



"Kürt Teavûn ve Terakki Gazetesi", rûpelî yekeînî.

# NALÎ Dilsoz û hesretkêşekî welatê xwe

## Nijad Yaruk

Hozanê Kurd Nalî, di sala 1797 an de, li gundê Qerecdax, ku girêdayê Şerezûrê ye ji dayika xwe dibe. Navê wî yê rastin Mele Xidir e. Li Qerecdaxê dest bi xwendina xwe dike, dawî li Silêmaniye xwendina xwe kuta dike. Piştî 23 salên ku li Şamê dimîne, ji bo serdanek tê Stenbolê û bi daxwaza ji mîrên Babanan Ehmed Paşa, li Stenbolê niştecih dibe.

Nalî tim bi hesret û evînek mezin jiyaye. Ev hesret, di xortaniye wî de, xwe di evîna keçikek de diyar dike. Di vê demê de gelek helbestên evîndariyê dinivîsine. Piştî ku digihije evîna xwe û ji welat dûr dikeve, bi hesreta welat dilê wî disoje û li ser vê evînê qesideyan dinivîsine.

Navê ku wî li xwe daniye, bi rastî ji rewşa wî diyar dike. Lewra nalîna wî ya li ser hesret û evîna welat tu car kêm nebûye û tim dilê wî kelijandiye.

Di qesideyên xwe de, pirranî gelemseyên gelê Kurd aniye ziman. Li ser azadî û ser-bixwebûnê gelek berhemên delal afirandîye. Ji ber vî ye ku, hozanên edebiyata Soran, Elâdin Seccadî, Giwî Mukriyanî û Maruf Xeznedar, ew dinav edebiyata Kurdi ya klasik de, hozanekî bi nav û deng dihesibînin.

Dîwana Nalî, di sala 1913 an de, ji alî nîvîskarê Kurd Meryavanî ve li Bexdayê hatîye çapkirin.

Nalî ji alî mijokdarên Tirk ve, di nav "Edebiyata Dîwan a Tirk" de tê hesibandin. Ev politikayên ku bi talankerî û hovîtiyek mezin, ji sed salan ve li Rojhilata Navîn, di ziya çand û edebiyata neteweyen herêmê ji xwe re kiriye kar, xwestiye Nalî ji, ji gelê Kurd bidize. Belê berhem û helbestên hozanê mezin li holê ne û wek şiqamek li rûye van, mijokdarên talanker dikevin.

### Tipa "a"

Çaweket agir le sîney 'aşiqî miskin deka  
Mest e, meylî çen kebabekî dili xwênen deka

Talibî lêwin û elqey zulfman nişan deda  
RARREWI Misrin û ew rûman le mulki Çin deka

Ta mu'eyin bê ke zor in desgirî w deskujî  
Ferqî ser, pencey be xwênatî hena rengin deka

Bê qisay xunçey demit katî tebesum rûberrû  
Hetkî şu'ley berq û nezmî dayîrey perwîn deka

Tirî mujganit le sînem da deçê bo pîri dil  
Hênde keçayîne qesdi xanedanî dîn deka

Gul be dem badî sebawê pêkenî ye'nî were  
To le weslim bo bere, ew boye bulbul şîn deka

Çawî min behri muhitî to ye bo defî gezend  
Lêt mu'eyen bê ke Nalî gul be dil perjîn deka

### Tipa "n"

Ke to y Qâble, demit sa bêne, qurban!  
Le ser quble dilim meşkene, qurban!

Were binwarre dû destî henayîm  
Henayî çî? Hemû xo xwêne, qurban!

Şeqî ke, xeyrî hubî toy têda bê,  
Bo destî xot dilim derbêne, qurban!

Le bo xelqî xelat bexşanî maç e  
Xelatî min hemû xo cwêne, qurban!

Fitûrî çawekanit nanwêni  
Be Nalî fitne bes binwêne, qurban!

Refiqan! min ewa roym le latan  
Le melzûman bila çol bê wulatan

Bila sa şar be şar û dê be dê bîn  
Le des yaran bikeyn teyîy wulatan

Melén kelki ne bû, royi, cehennem!  
Serim qelxan e bo tîri qedatan

Seferman çunke rîy hat û nehat e  
Du'aman bo biken, êwe û Xudatan!

Minim serkirdetan bo leşkîri xem  
Detîrsim min birrom, bişkê supatan!

Şikarî wehşîyan bes destemo ken  
Newek ber bê şikarî xanezatan

Ewend ercû deka Nalî ke car car  
Biken yadî muhibî bê rîyatan

**Tipa "t"**  
Meke îxlafi ew we'dey ke fermût  
Dexîlit bim xaney sebrekem sût

Le rût û qûtî wek min rû mepoş  
Ke wesli to ye qûtî 'aşiqî rût

Mujet qulabî ye hem tîr û hem şîr  
Birrot mihrabî ye hem taq û hem cût

Le sindûqî pirî sînem bitirse  
Ke agir ber bîdate text û tabût

Le ber xendey lebî le'lî eto bû  
Kewa şekker debarî, gul depişkût

Dekey nexçirî sed dil her be tîrê  
Îlahî her bîmînî dest û bazût!

Çi şîrin e xutûtî dewrî lêwit  
Belê me'lûm e, xoş e, xeti yaqût

He Nalî! belku bîkêşî be nalîn  
Binale, damenîşe mat û mehbût

**Tipa "z"**  
Xaw û bê xawî du zulfî xawîm ez  
Çawecawî yek xezale çawîm ez

Ger niye awir le sînem da be taw  
Bo ç'le ber qulqul xerîqî awim ez


Narî sînem ger ne bê, xerqim emin  
Awî çawîm ger ne bê, sútawîm ez

Xeyrî zulfî to ke riştey 'umirme  
Des le "mafîha"y zeman birryawîm ez

Taze ebrot wusme kêşawe be naz  
Dil letî şimşîri taze saw im ez

Ey refiqan! suhbetî Nalî meken  
Bo çî? ke min lewra wekû bednawîm ez.

# AZADÎ



Abdurrahman Durre

## Kemalîzm û dîn

Divê ku herkes, vê rastiyê rind fêm bike û bizanibe ku, hîmê kemalîzmê, li ser rakirina "şerîfetê" hatîye danîn. Yanî Kemalîzm şerîfetê qebûl nake, dij û neyare şerîfetê ye. Ez dibêjim qey, herkes vê rastiyê dizane, İzahkirina wî ne pêwist e. Bi bawerî ûzanîna min, hem kemalîst, hem jî kel-mîst, hem dîndar, hem jî sextekar, herkes vê dizane. Lî belê, herkes bi maneya şerîfetê nizane. Gerçî musulmanen heqîqî û bi hiş û zana, rind dizanîn ku, şerîf "ehkamî Quranî ye, qanûna İlahî ye". Kemalîstên xasûk (qurnaz) û dubare jî, dizanîn ku, şerîf qanunê Quranî ye. Dîndarîn sextekar jî, bi vê heqîqetê dizanîn. Lî belê, kemalîstên kelmîst û dîndarîn sextekar, gelên nezan û nexwendî dixapînîn û gel nizane ku ev sextekar, weke gurên ku post wêrdigirin (li xwe dîkin) û dikevin nav koza berxan, wan bi qelaşî dikujin, mirar dîkin û laşen wan dix-win. Ên din, weke eş-qiyayen ku kincen ew-liyayen li xwe dîkin, rîbirî û dîziyê dîkin. Çek û silehîn wan jî, dîn û muqadesat in. Di binê navê Islamî de, partiya Şeytan dame-zirandine (ava kirîne), alîkarî û hevalbendiya zaliman dîkin.

Ji bo musulmanen, dilpak û temîz, mezlûm û mehkûm, van sextekar û neyaran, rind nas bikin û xwe ji derew û dek û dolabîn wan biparêzin û ji tesîra wan xelas bibin, divê çend rastiyen rind bizanibin û hîn bibin.

1- Şerîf; navê qanûnê İlahî ye û ehkamî Quranî ye. Quran, di sûretê Maîde, ayeta '44' an de, wiha dibêje: "Kesîn ku bi hukmî Quranî (qanûnê Quranî) emel nekin, ew bê şubhe (şik) kafir in." Di ayeta '46' an de jî wiha dibêje: "Ew zâlim in." dîsa di eyîn ayetî de dibêje: "Ew munâfiq in."

2- Bi sedan ayetîn Quranî û bi hezaran hedîs, li dîndarîn sextekar, lanet û xezebê dîbarînîn

3- Heval û alîkarîn zâlim, kafir û munâfiq jî, sextekar in. Di derheqê vê de jî, ayet û hedîs hene.

4- Hîmî dînê Islamî li hemberê zîlm û neheqîyê hatîye danîn. Hemû insanan wek hev dizane, mafîn hemû insanan jî, wek hev nas dike û dide. Kesîn ku van prensîban qebûl neke ne musulman e.

5- Li gora Quranî, irq, reng, ziman û kultura herkesî, ayet, belge û nîşanîn Xwedê û mezinaya Xwedê nîşan didin. Înkariya yekî ji van, Înkariya ayetîn Xwedê ye, kafirî ye û bêîmanî ye. Ji bo hînkirina van tiştan hûn dikarin li sûretê "Kom" ayeta '21' an binêrin.

Li gora van hîman ên wekî wan, ku di Islamî de hene, kemalîst, hevalen kemalîstan û alîkarîn wan, hem ne musulman in, hem jî zâlim û munâfiq in. Ev gotina Quranî ye û hukmî wî ye. Kesîn ku ji Quranî bawer dike, imana wî/wê, wiha ye: Herwekî hemû gelên dînyayê, gelê Kurd jî, bi irq, ziman û çanda (kultura) xwe, ayet, belge û nîşana Xwedê û naskirina mezinâhiya Xwedê ne. Înkarkirina wan, Înkarkirina ayetî Xwedê ye, ku ev jî kafirî, bê dînî û bê wîcdanî ye.

Ew kesîn ku doza dîn û biratiyê dîkin û bi kemalîstan re dimeşin, dibin aletê siyaseta wan û tevgera wan. Ew kesîn ku kirinê li dijî gelê Kurd rast dibînîn, an jî, bi ci awayî dibe bila bibe, ku nexwazin gelê Kurd jî, weke hemû gelan ser-bixwe û azad bibin, ew kes hem ne musulman in, hem jî ne insan in, gurên di postê miyan de ne, eş-qiyayen di kincen ewliyan de ne, bi navê partiya Yezdan. (Xwedê) in, lê ji partiya Şeytan in. Divê musulmanen dilpak û saf, bi van şeytan-nexapin, tufê rûyê wan ê reş û qirêj bikin. Hîzbullah û hîzbulâ Kontrayan, hîzbulâ Şeytan û hîzbulâ rehmanê rind ji hev nas bikin û êdî bi derew, dek û dolaban nexapin.

# Di 12 saliya 12'ê Îlonê de şerê taybetî jî îflas kir

**Hasan H. Deniz**

12 sal berê, cûnta ya faşist ya 12'ê Îlonê pêk hat. Di van 12 salan de tu armancen pêkanîna cûnta ya faşist bi kar nehatin. Wek ku tê zanîn armanca cûnta ya faşist, ya tewra mezin rawestin û tunekirina şerê rizgariya neteweya me bû, pişt re rakirina têkoşîna demokrasiya gel û şoreşa Tirkîye dihat.

Bi vê armanca faşistî û mijordarî, serbazên artêşâ Tirk, dest danîn ser hikûmeta siyasi û ji nû ve dest bi işgalkirina Kurdistanê kîrin. Li Tirkîye ji hemû mafêñ demokratiki û mirovahî qedexe kîrin. Dew-

let, bi hemû hebûnên xwe yên leşkerî, aborî û wekî din, bi ser gelê me û şoşergerên gelê me ve hat. Bi rojan û mehan, gund işgal kîrin, gündiyân tevî jin, mîr û zarokan der xistin derxaneyan, dilêdanê re derbas kîrin, heqaretîn tewra mezin li wan kîrin û bi hezaran mirovîn Kurd xistin zîndanan.

Cûnta ya faşist, wek ku tê zanîn di sala 1983 an de, cilê xwe yên leşkerî guherandin û yên sivil li xwe kîrin. Armanca vê guherandinê, domandina biryar û qanûnên 12'ê Îlonê bi şiklek rûveşartî bû.

Pişt re, bi iqtidara Kenan û Özal, ev cûntaya faşist domi-

ya û niha jî bi iqtidara Özal û Demirel-İnönü didome...

## Dİ VAN 12 SALAN DE ÇI BÛ?

Di van 12 salan de, têkoşîna demokrasiya Tirkîye ya bi destê rîberen gelê Tirk hate rawestin û lipashxistin. È ku li vê paşxistinê binêre, dikare bifikire ku têkoşîna demokrasiya gelê Tirkîye li paş ket. Lî rastî ne wiha ye; şoreşa welatê me, bi xwe re şoreşa Tirkîye jî li pêş dixe...

Di van 12 salan de, hem di zîndanan de, hem di welêt de û hem jî li derveyî welêt hêzên şoşergerî, pêşveçûnek xurt pêkanîn. Bi berxwedana

zîndana Amedê, politika ya dijmin ya tunekirina rîberen gelê Kurd îflas kir û Partî bi ser ket. Berxwedana zîndanê heta sala 1984 an di vî warî de rolek baş leyist. Bi destpêka hilpişkîna 15'ê Tebabê ya 1984 an, rola berxwedanan ji zîndanan hilpişkiya çiyayên welêt û ew roj û ev roje hîn bilindir didome.

## İRO REWSA DİJMİN ÇI YE?

İro, ci ji hêla siyasi, ci ji hêla aborî û ci ji hêla leşkerî ve rewsa dewleta Tirk, li hember şerê rizgariya neteweyî ketiye qonaxek dijwar. Gelê me, êdî otoriteya dewletê li ser xwe qebûl nake, têkiliyên xwe jê qut dike û di nava refen eniyê de hîn bêtir cih digire.

Dewlet, di warê aborî de ji heq der nayê ku barê şerê taybetî hilgire. Nexasim bi rakirina firokeyan, aboriya dewletê ketiye demekî hîn bêtir zor. Pereyên ku dide çete, tîm, kontra û çekan, ji qirika karke û gelê Tirkî têbînî. Ji ber vê yekê, rewsa gel jî, her roj hîn xerabtir dibe û feqîr dikevin. Ku ne bi alikariya dewletên emperyalist be, Tirkîye rojekê tenê jî nikare şer

bidomîne, ji ber ku xezîneya xwe, ziwa bûye.

## REWSA GELÊ KURD

İro gelê me, ji her demê bêtir baweriya xwe bi serokatiya xwe anîye, bi Partiya xwe anîye û ji her demê bêtir di nava refen enî û artêşê de cihê xwe digre û ji her demê bêtir, ji bo pêkanîna xwesteka xwe ya welitek serbixwe û azad li ber xwe dide, şer dike û serî hildide.

Bê guman em dikarin eşke-re bikin ku di van 12 salan de şerê gelê me li hember şerê taybetî gihişt merhaleya seranserî (denge) û ev jî nîşana bikarnehatina tevahiya armancî 12'ê Îlonê ye, îflaskîrina politika û şerê mijokdarye ye. Ji ber vê yekê bi serbîlindahî û rûmetî em dikarin bêjin ku serkevtin ya gelê me ye û gîhaftina serkevtinê bi rîberiya Partiyê, ji bo gelê me pirr nêzîk bûye. Bi vê sedemê girîng e em bi neteweyî tev de tevgera xwe hîn xurttir bikin, şerê xwe di her warî de bilindir bikin û yekîtiya xwe ya neteweyî gestir û qewintir bikin û li hember leyistok û provokasyonên dijmin pirr bi hisyari di nava refen şerê rizgariya gelê xwe de cih bigrin.

## Rastçêkerên xaçepirsa bi xelat

Di nav xwendevanê ku bersiva xaçepirsa 27 an rast çêkiribûn de, ev navê jérîn bi peşkê (qûra) hatin tesbitkîn û pirtûka Gabar Çiyan "Kerek û heft gur û mindalekan" hate birêkin. Ji vê pê ve, dê mehê carek xaçepirsên bi xelat bêñ amadekirin û dê xelata rastçêkirina pirtûkên bi kurdî bin.

Zeki Beyazit / Ankara, Mahmut Yıldız / Girtîgeha Aydinê, Harbi Soylu / Girtîgeha Aydinê, Taciser Varlı / Ankara, Mehdi Tanıklulu / Girtîgeha Diyarbekir, Cengiz Güngör / İstanbul, Ruken Gülsen / İstanbul, M. Yunus / Ankara, A. Kadir / Mîrdîn, Mesut Alan / Mîrdîn, A. Bozan / İstanbul, Kemal Baran / İstanbul, R. Biçûk / İstanbul, Berfin Çile / Diyarbekir, Havîn Porzer / İstanbul, S. Nezan / İstanbul, A. Belge / İstanbul, A. Güll / Hekarî, N. Zekî / Urfa, S. Xelîl / Diyarbekir, M. Nazım / Bodrum, G. Oli / Diyarbekir, Mirado / Mûş, A. Pispôr / Adiyaman, H. Kaytan / İstanbul




## XÂÇEPIRS

Çeperast: 1-Hozanê Kurd. Di sala 1927 an de, li Diyarbekir ji dayîka xwe dibe. Piştî xwendîna li Diyarbekir û Ruha, li zanîngeha Enquerê, beşa ziman, dîrok û erdînîgari dixwîne. Helbesten xwe bi tirkî dinivisi, belê naveroka helbesten wî, li ser pîrsîrêk û dijberiyên Kurdistanê bûn. Pirtûkekê tenê weşandiye, navê wê, "Min qeydan kevin kir ji hesreta te" ye. Di sala 1991 an de, cû ser dilovaniya xwe. Di wêne de tê ditin/ Navê şirketek Ingilizan yê petrolê 2-Zindi, bi can/ Tebat 3-Sembola İridiûmê/ Li Rojhilata Navîn navê welatek/ Muxtar 4-Xwegendîrandin, qulupandin/ Biryara mehkemê 5-Cihê ku genim lê dibe ard/ Bi tirkî şop, rîç/ Lehçe 6-Herf/ Notayek 7-Lî Kurdistan navê eşirek/ Cem, digel, nik 8-Fikirandin 9-Jîna ku mîrê wê miribe-dev jê berdabe/ Li İrlanda navê rîxistîne kî li dijî Ingilizan têdikoşe 10- Ji agir radibe/ Bi zimanê biyanî pol, sinif

Serejér: 1-Slogangêri 2-Lî Japonya navê bajarek, Amerika yek ji bombeyen atomê avetibû vî bajarı 3-Sembola Mangenez/ Nebatek ku jê kînc çedîbin 4-Sererast/ Radyo û televîzyona İtalya 5-Mehkemekirin 6-Navê İxdîr a bi kurdi/ Esir, girtî 7-Keç/ Visan/ Şe 5-Lt/ Embaz 6-Lear/ Esir 7-Ekrad/ Îlon 8-Yen ji dê û baveki (ji bo lawan) 8-Teni/ Püt/ Adn/ Jî 9-Êzidi 10-Nam 11-Ez/ Si 12-Wali

## Amadekar: Rasto Zîlânî



Fîkiyek 9-Xîzan 10-Berz, bilind 11-Cesaret 12-Pereyê ku ji bîli keş didin karkeran

### BERSIVA XÂÇEPIRSA HEFTİYA ÇÜYİ

Çeperast: 1-Evdille Péşew 2-Ser/ Tekûz/ Za 3-Ajan/ Artîn 4-Riviera/ Dasî 5-En/ Sm/ Daîmi 6-Kabe 7-Danasîn 8-Dad/ Zîl 9-Êris/ Roj 10-Lanet/ Nî Serejér: 1-Esaret/ Dîl 2-Vejîn/ Dara 3-Drav/ Kadîn 4-6-Navê İxdîr a bi kurdi/ Esir, girtî 7-Keç/ Visan/ Şe 5-Lt/ Embaz 6-Lear/ Esir 7-Ekrad/ Îlon 8-Yen ji dê û baveki (ji bo lawan) 8-Teni/ Püt/ Adn/ Jî 9-Êzidi 10-Nam 11-Ez/ Si 12-Wali

## KARTA ABONETİYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ..... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiyê razînin:

Li Tirkîye û li derive: Y. Serhat Bucak  
İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevlî kopyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

Navnîşana Welat: Nuruosmaniye Cad.

Atay Apt. No:5 Kat:1 D:4 Cağaloğlu / İstanbul  
Tel: 511 57 60 - 511 66 02 Fax: 511 51 57

Mercen abonetiyê:

Li hundir	Li derive
6 meh 120.000	60 DM
12 meh 240.000	120 DM

Hebû nebû... gundek hebû, navê gund, gundê Rêncbera bû. Pîr û kal li wî gundî nînbûn. Gundî hemû xorî û law bûn û ewê pîr dibû û pêtir dixwar ji hindê ku berhemî bide, nanê wî hîn bû, lewre adet li gund ew bû ewê pîr û kal dibû, kurê wî, ew dibir ser çiyayê bilindê li hindavî gundî û wî di çiya de davete xwarê da ku bipelixe û bimire.

Evca rojekê bû dora "Meçkoy" da babê xwe yê kal bibe serê çiya û bavêje xwarê. Lî herdu pêtê babê wî seqet bûn. Evca Meçkoy neçar bû û rabû babê xwe li pişta xwe kir û berê xwe da çiya. Pişti qonaxekî Meçkoy westiya û xuh (xwêdan) bi pişta wî ve hate xwar. Babê xwe danî ser berekî û rûnişt bêhna xwe veda. Babê wî got: Te xêr e kurê min, te ez

# Hebû nebû

danîm? Meçkoy got: Ez westiyam, dê bêhna xwe vedim. Bişkûrînek sar li ser lêvên babê wî çêbû. Pişti hîngê Meçkoy careke din bavê xwe li pişta xwe kir û qesta çiya kir. Gelek neçû, Meçkoy westiya û bû ihe iha wî. Mecbûr bû careke din bavê xwe danî û bêhna xwe veda. Babê wî pîrsiyarkir: Vê carê te ji bo ci em rawestandin kurê min? Meçkoy got: Bab rê dirêj e û hemû hevraz e û pêdîviye ez bêhna xwe vedim. Bavê wî bi dengekê xendiqandî pê kire kenî. Pişti bêhnekê Meçkoy bavê xwe hilgirt û alikariya wî



bike. Dîsan bavê xwe danî. Bavê wî neşîya xwe û bi dengekê bilind. Kire kenî û li çiya deng veda. Meçko ji babê xwe pîrsiyar kir: Erê bab tu nabêjî ji min re tu ci dike û tu nêzîkî mirinêyî? Babê wî bersiv da: Kurê min ez bi te dikenim, kenê min û li vî adetî tamsar ê li gundê me. Tu hîra xwe nakî sibehê dê tu jî pîr bibî û zarokê te dê te jî li pişta xwe bikin û bînin di vî çiyayî de bavêjin. Meçkoy me guhişî û hîzra xwe di gotina babê xwe dakir "Erê min ci (tu) carâ ev hîzre nekiriye, ma bavê min rast nabêje. Kurê min

rabe min bikuje ji bo ci? Bes ji ber hindê ku ez pîr bûm. Na... na. Vî tişti kesî negotiye û kes jî, jê razî nabe." Xwe nêzîkî bavê xwe kir û destê xwe bi serê wî yê spî da û rabû careke din bavê xwe li pişta xwe kir û zîvrîn gund. Û ji wê rojê pê ve ew adet li gundî vebiriya.

Ev serpêhatî li gundê "Bamernê" li Kurdistan Başûr hatiye berhevkirin.

Ferhengok

Pelixî: Helpejî

Westiya: Mandû bû

Xuh: Areq

Bişkûrînek: Zerde xenêk

Hîngê: Ewsa

Pêdiviye: Pêwîste

Hêbtî: Sersûrman

Guhişî: Tamar

Zîvrîn: Geranewe

Vebîrya: Birayewe

**Berhevkirin: Bavê Rojê**

**Ênane ser tîpên Latînî:**

**Mehabad Kurdi**

## Zarokno çavê we bi ronî !

Zarokno êdî hûn jî dikarin bi kurdî bixwînîn. Pirtûk ji bo we jî êdî têr weşandin. Ev cara pêşîn e ku li welat û li Tirkîyê ji bo zarokan pirtûk tê weşandin.

Rêza çîrokêن zarokan di bin navê HEBÛ TUNEBÛ de, derket. Weşanê Navena Çanda Mezopotamya, cara yekemîn e, ku ji bo zarokan dest bi xebatek wiha'kiriye.

Di pirtûkê de du çîrok hene. Navê çîrokek jê, Elê Newêrek û ya din jî Xatûn Meymûn e. Ev herdu çîrok, ji aliye Prof. Celîl Celîl ve hatiye berhevkirin. Em Prof. Celîl Celîl bi gelek xebatê çandî, dîrokî, û hwd. ve, ji nêzîk ve nas dîkin.

Pirtûk li gorî devoka herêmî hatiye amadekirin û rastnîvîs û gramer jî, li gorî Prof. Qanatê Kurdo hîm hatiye standin. Dibe ku kesen hînî rastnîvîs û gramera mala Bedîrxaniyan bûbin ku rojnameya welat jî, li gorî wan qaydan tê weşandin, hînek

zorîyê bîbînîn. Weşanxane bi xwe jî, behsa vê yekê dike û gelşen ku ji aliye ziman ve hene dide diyar-

ke. Herdu çîrok jî balkêş in. Xwendevan heta xwendîna çîrokan neqendînin dê ji destê xwe der dixin.

En ku pirtûkê bixwazin, dikarin ji vê navnîşanê temin bikin.

Mezopotamya Kültür Merkezi

Tarlabası cad. No: 128  
Taksim/Ist Tlf: 254, 48 65

## Helbestêñ zarokan

### Nazê rabe

Nazê, Nazê rabe rabe  
Nazê ji xewa giran rabe  
Nazê Nazê rabe rabe  
Ji bo reben û jaran rabe  
Nazê rabel

Şervan im serê çiya me  
Va blîndar e Kurdistan  
Nazê Nazê blîn kûr e  
Dermanê wê tîm xwîn û can  
Nazê rabel

Digerim li jêr û li jor  
Li wan deşt û van zozan

Nazê Nazê canfîda me  
Jiyan e rîka şehîdan  
Nazê rabel

### Girîna Cizîrî

#### Şekirê

Li ser mila şekirê  
Li nav dîla şekirê

Mîna canan şekirê  
Xweşya jiyan şekirê

Rengêbihar şekirê  
Heyva Avdar şekirê

Bûka me ye şekirê  
Çûka me ye şekirê

### Beşîr Botanî

Hîvan kurê sorê ye  
Şol koteke û zorê ye  
Hêsta girar ne kelî  
Hazir e li ber dorê ye

Hîvan şêrê domiz e  
Şekroka tîrş û Miz e  
Zarokno jê birevin  
Karê wî her topiz e

Nola gîskê dermal e  
Pir paqîj û delal e  
Qoç û pehîna didit  
Ji lew her bê heval e

Lê ku li mala xalê ye  
Nobedarê malê ye  
Nahêle tîştek bişkê  
Ji salê heta salê ye

Siwar be li hespê bayî  
Bifre were Bexdayê  
Xudê te xweş bihêlit  
Bê te sebra me nayê

Hîvanê hejde heyvî  
Hêsta nîza bipeyvî  
Ji şes kur û heşt nevî  
Tu yî berdest û hêvî

### Sebri Botanî

# 'Muzika gelên rojhilatê ketiye nava hev'

Muzikvanen Sovyetê li Ermenistanê, Tirkmenistanê û Azerbeycanê meqamên folklorî, ji holê rakirin, ev ji xesarek mezin e, ji muzika folklorî re.

Nûrî Îskender ji bo xebatê Cemîla Celîl wiha dibêje: "Ruhê muzika Rojhilatê, tê de xuya nake. Ez emanet û dijetê nabînim di notakirina Cemîla de ji bo folklorê. Divê folklor bi emanet nota bibe, da ku bibe weke arşivekê ji pêşerojê re."

Mamoste Nûrî, weke tê zanîn haya we ji muzika Kurdi baş heye, hûn vê muzikê çawa dibînin, berê, niha û di pêşerojê de?

- Dema ez muzika Kurdi dibişsim, dibêjim, min ew ji zû ve bîhistiye, muzika Kurdi ketiye hundirê canê min û min ji binî ve dihejîne. Ev muzik tu carî ne dûrî min e, min ew bi riya tenbûrvan û dengbêjan bîhistiye, lê bêhtir min a kevnare bîhistiye. Ez vê muzikê parçeyekî pêwist dibînim, ji muzika vê herêmê. Em bi vê muzikê re dijin û bi rasti ev muzik her tiştê dilê mirov dibêje, ew parçeyek ji jiyanâ me ye. Muzika Kurdi ya bermayı (tarasî) heta niha weke xwe maye, lê di van cil salen dawî de, muzikvanen Kurd ji bo pêşxistina muzika xwe xebîfne. Xasma li Kurdistan "Iran û Iraq ê." Li Kurdistan "Tirkîye" ji xebatê muzikî hene lê, di baweriya min de nagihîn xebatê din. Li Sûri, muzika Kurdi ya bermayı weke xwe maye. Pêşketina muzikê li vir, nizm û normal e. Ez karim hinek mînak ji bînim, min, stranen Seid Axayê Cizrawî, Hesenê Cizrawî, Arifê Cizrawî û Cemîl Horo bîhistine. Destanen geleri, stran û muzika goven dan, dilanen folklorî, ew tev de ahengen germ dibêjin. Kela dil tînin zimên, lebateke xurt di wan de xuya dike, ji yana miletê Kurd, li çiya, ne wal û mîrgan tîne bîra mirov. Belê, destan cureyeke serbixwe ye. Çirokên lehen giyê û serpêhatiyan dibêjin. Bi rengekî mezin, li ser evînê, li ser mirinê diaxivin.

Weznîn kevnar, tevan der bas dike û li pişt xwe dihêle.

Stranen Kurdi ji, li ser evîn û hezkirinê ne, hezkirina welat û jiyanê.


Heta kijan derecê, hûn ketine bin bandûra muzika Kurdi?

- Ev pirs min diheyîfne û ez, ji zû ve li bersivê digerim, ez dikarim bibêjim; muzika gelên vê herêmê ketiye nav hev, gel bi xwe ji ketine binê tesra hev, ci di muzikê de, ci di adetan de û heta di jiyanâ xwe de ji, van gelan bi hev re tengasî dîtine. Dijwariyê di van salen dirêj de dîtine, pirri tişt van gelan digihînin hev. Serpêhatî, jankêşî û koçberî, ji ber vê yekê muzika Kurdi ne dûrî min e.

Muzika Rojhilatê û bi taybeti ji ya Kurdi, bi xemgîniya xwe ve tê naskirin, di nîrîna we de, ev xemgîni ji ber ci ye?

- Ji ber ku gelên vê herêmê, jîna xwe bi dijwarî û zîvarî (rebenî) borandin. Diktatoran li vê herêmê gel diajotin ser gelemşeyan. Her diktatorek dihat, dibû sebebê gelek ceng û şeran. Miletê vê herêmê, di nava şer û qetliaman de dijîn, vê yekê hişt ku muzikeke xemgîn derkeve holê. Em hêvidar in, ji iro û bi şûn ve ev muzika xemgîn rabe û li şûnê, muzikeke xweş û ges were û em têkevin jiyanekî nû.

Cemîla Celîl di pirtûka xwe de, riyeke nû di notakirinê de daniye, stranen folklorî yê Kurdî, bi cureyekî Ewrûpi nota dike. Weke strana "Ey Nêrgiz". Bi solmînor yanî bi nehawend nota kiriye, stran bi xwe ji



Nûrî Îskender di çend xêzan de:

- Sala 1938 an, hatiye ser rûyê dinê, bi eslê xwe, ji Ruhayê ye.

- Li Qahîrê (paytexta Misrê) di sala 1964 an de, Enstituya bilind ya muzik perweriyê xelas kiriye.

- Heta sala 1986 an, li dibistanen Helebê mamosteyê muzikê bû

- Muzika gelek filiman daniye û gelek berhemên muzikî ji, ji TV ya Sûri re pêşkêş kiriye.

- Li bajarê Helebê me, vê hevpeyvinê pê re bi zimanê Erebî çêkir.

meqamê beyat e, hûn vê yekê çawa dibînin?

- Cemîla nota nîvîne û bîyî ku rib (çaryek) derece tê de hebin, me ev yekê jê pîrsi û me jê re mînak anî ji pirtûka wê, wê bersiva me da û got: "Ji me re ferq nake.."

Yanî wê ji weke muzikologen Sovyetê, ji qazî ve rib derece rakirine. Di baweriya min de ev kar li xesarê ye, ji ber ku gelekî ji qîmetê folklorê dadi xîne û li dawî muzikeke mustehcen (ne esil) der tê. Ruhê muzika Rojhilatê, tê de xuya nake. Ez emanet û dijetê nabînim di notakirina Cemîla de ji bo folklorê. Divê folklor bi emanet nota bibe, da ku bibe weke arşivekê ji pêşerojê re.

Yanî ev şâsiyek e ku Cemîla ketiyê, an rîceke nû ye?

- Na... Ev rî heta ku nû be ji, ez şâş dibînim. Muzikvanen Sovyetê li Ermenistanê, Tirkmenistanê û Azerbeycanê meqamên folklorî, ji

holê rakirin, ev ji xesarek mezin e, ji muzika folkloñ re.

Mamoste Nûrî, we tu elaqe di navbera muzika vê herêmê de dîtiye, her muzikkek çawa tesîrê li ya din dike?

Miletê vê herêmê, bi hezaran salan bi hev re mane, di milê hev de şer kiriye, lê her miletek xusûsiyeke wî heye. Têkiliyên van salen dirêj hiştine ev gel nêzîki hev bibin.

Gelo muzik dikare kîna di navbera miletan de heye, rake?

Bê guman, bê guman huner, xasma muzik dikare amadekariyê ji jiyanekî nû re bike, jiyanekî dûrî listikên politîkî yê ku ji derveyî herêma me, tê. Divê ciwanen van miletan rola xwe bîlzin û nefesa şovenîzm û faşîzmê ji nav gelên vê herêmê rakin.

Mamoste Nûrî, berî heriştî hunermend dixwaze

tiştîkî bigihîne yê dora xwe, hûn bi muzika xwe, dixwazin ci bibêjin?

Tiştê ez dixwazim bibêjim, niha û di pêşerojê de; evîn, mirovatî, jiyanekî nû û xweşik, ez ji cîhanê re dînîsim ku berê xwe daye aşitiyê, evînê û jîneke xweş û ronî.

Gelo li ser ci bingehî, muzikeke rojhilatî ya pêşketî ava dibe?

Heta ku em muzika Rojhilatî Navîn, bi pêş bixin, divê em li meqamê xwe yê kevin vegeerin, li ser bin gehêvan meqaman, em muzika xwe ava bikin. Ev meqam ne bi wê hêsanîya ku hinek guman dikin hatiye, ew ji afirandinê miletê vê herêmê ne. Bi aîkariya her muzikvanekî, ji vê herêmê, em karin xwe bigihînin muzikeke nûjen ku bibe dengê mirovên vê herêmê.

**Hevpeyvin: Jan Dost**